## Muzîk xilasbûn e!



Muzîk ji aliyekî ve Estherê bi fizîkî ji mirinê xilas kir, bi ruhî û derûnî ji dîmenên li ber çavan xilas kir û cihûyên kampê bi muzîkê çûn mirinê. Dîsa dipirsim, muzîkê kê ji çi xilas kir? Di heman salê de Estherê nexweş dikeve û nikare êdî di orkestrayê de cihê xwe bigire... ***Sozdar Koçer / R.2***

## Dikim ku 'roman'ekê bikujim




Romaneke Firat Ceweri heye, navê wê 'Ez ê Yekî Bikujim' e. Di sala 2008'an de li Stenbolê ji nav Weşanên Avestayê derketiye, ji 147 rûpelan pêk tê. Roman ji du beşan pêk hatiye. Divê her beşek bi serê xwe jî bê nirxandin. Di beşa yekê de teşeyê romana Dostoyevskî ... ***Yaşar Eroglu / R.5***

---

xwebûn

26 TÎRMEH- 1 TEBAX 2021 HEJMAR:84 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

---

# Çanda lînçê ya li dijî kurdan

Di rojên dawî de li Afyon, Konya û Enqereyê 3 êrîşên cuda pêk hatin. Di êrîşên nijadperest ên 3 salên dawî de 4 ciwan hatin qetilkirin û zêdeyî 10 kurd birîndar bûn. Li gorî rapora ÎHD'ê ya 2020'î li dijî kurdan 14 êrîşên nijadperestî pêk hatin. Têkildarî lînçê Civaknas Azad Bariş diyar kir ku lînç amûreke kontrol û serdestiyê ye. Bêdengî lînçê rewa dike... ***R.3***



## Êrîşên 24'ê Tîrmehê

24'ê Tîrmeha sala 2015'an li Kurdistanê pêvajoyek nû dest pê kir. Bi vê pêvajoyê re planên qirkirina kurdan û dagirkeriyê dan destpêkirin. Di vê rojê de dewleta tirk li dijî kurdan şerekî topyekun da destpêkirin. Artêşa tirk di 24'ê Tîrmeha 2015'an de li dijî herêmên Zap, Xakûrkê û Metînayê êrîşên hewayî da destpêkirin. Ev êrîşa ku bi dehan balafirên şer pêk hat, bi her awayî pêvajoyek nû da destpêkirin. Beriya vê pêvajoyê di îlona 2014'an de ji aliyê Musteşariya Pergal û Ewlehiya Giştî 'Plana Rûxandinê' hat amadekirin. 30'ê cotmeha 2014'an jî civîna Desteya Ewlehiyê ya Milî pêk hat û ev plan hat erêkirin. Ev bû civîna herî dirêj a di dîroka dagirkeriya tirk de. Di vê civînê de biryar hat dayîn ku pêvajoya çareseriyê bê dawîkirin û operasyoneke tasfiyeyê... ***Felemez Ulug / R.6***

## Bi Lozanê erka înkarê dan tirkan

Di ser Peymana Lozanê de 98 sal derbas bûn. Bi vê peymanê digotin kurd û tirk yek parçe, mîna "goşt û neynûk in." Vê peymanê bi înkar û feraseta netew-dewletê re Komara Tirkiyeyê ava kir. 98 sal in Kurdistan bûye çar parçe û kurd tune tên hesibandin. Dewletên di şerê yekemîn ê cîhanê de bi ser ketin û hikûmeta Tirkiyeyê di navbera xwe de, di 24'ê Tîrmeha 1923'yan de Peymana Lozanê îmze kirin. Ji avabûna Tirkiyeyê û vir ve Peymana Sewrê ya di 10'ê Tebaxa 1920'î de hat îmzekirin wek 'teslimiyet' û Peymana Lozanê jî wek 'serkeftinê' hatin ragihandin. Bi Lozanê re înkar û ... ***R.7***

## Tîrmeh û rûdanên tije xwîn

Tîrmeh çileyê herî tîr ê meha havîna her salê ye. Germahiya wê her çiqas germ û giran be jî jiyan têde bi liv û lebat e. Rûdanên di tîrmehê de qewimîne li Kurdistanê gelek in. Li vir ez ê amaje bi hinek ji wan rûdanan bikim ku di 'hişê civakê' de tim zindî bûne.Rewşa îro ya girtiyên siyasî li Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê dîrokeke tije şoreş û fedakarî bi bîra me tîne. Dîrokeke ne zêde dûr lê tije destkeft ku li zindana Amedê hat nivîsîn, 'berxwedan'a wan ji nifşên piştre bû 'jiyan'. Qehremanên doza azadiyê yên ku dizanîn agirê canê wan ê ji hêlekê ve bibe...

***Kakşar Oremar / R.12***

# KNK: Kurd êdî ne faktor in bûne aktor



Kongreya Neteweyî ya Kurdistan (KNK), bi armanca yekitiya neteweyî ya gelê kurd pêk bîne û di nava partî, sazî, kesayet û rêxistinan de hevsengî, yekrêzî û yekdengiyê çêbike, demeke dirêj e xebatan dike. Hevserokê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Ehmed Qeremûs têkildarî girîngiya yekitiya neteweya kurd û xebatên ku KNK dimeşîne ji rojnameya me re nirxandinên girîng kir... ***R.6***

## Faşîzm roşan de zî gonî rijna

Bawerîya îslamî de domanê Îbrahîmî û cinîya ci Sare nêbîyayêne. Îbrahîm wad keno eke Sare ra domanêk ci bibo do domanê xo qurbanê Homayî bikero. Domanêk înan ê bi beno û seba ke ci qurbanê Homayî bikero domanê xo gêno û şono koyêko herêma Morîya. Wexto ke kardî derg keno ke doman bibirno melekêk vendeno... ***Valere / R.9***

## Kongreya MXDŞ'ê ya 4'emîn dest pê kir

Ev demeke ku amadekariyên Kongreya Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê (MXDŞ) a 4'emîn dihat kirin. Beriya kongreya giştî, li hemû meclîsên gundan di çarçoveya amadekariyên kongreyê de civîn hatin lidarxistin û delegeyên kongreyê hatin hilbijartin. Di encama van civînan de 250 delegeyên ku hatine hilbijartin beşdarî kongreya giştî bûn. Ji oldar û rûspîyan heya hunermend û rojnamevanan, ji tevgera jin û ciwanan heya karker û kedkaran hemû beşên civakê beşdarî kongreyê bûn. Her wiha 50 mêvanên ji derdorên cûda yên civakî jî beşdarî kongreyê bûn.... ***R.6***

## Di fîlm û çîrokan de têkçûyîn

Mirov bala xwe bide fîlmên demên dawîn ên ku ji aliyê derhênerên kurd ve tên çêkirin, ev rastî pir aşkere tê dîtin. Karakterên çîrokên van filman hemû kesên têkçûyî ne. Bi ser nakevin, xwedî îtiraz bin jî di dawiya çîrokê de têk diçin. Dimirin, direvin, koç dikin, tên kuştin. Berxwedan bê feyde ye. Karakterên kurd di van çîrokan de nezan in, bê hêz in, neçar in, mexdûr in. Tenê ne berxwedêr in... ***Îlham Bakir / R.11***



## Potansiyela kurdan xurt e

Her roj em pê dihesin ku kesekî biyanî dixwaze fêrî kurdî bibe û bêhtir xwe nêzî kurdan bike. Ji Arjantînê bigirin heta Japonyayê, li heft parzemînan kurd bala cîhanê dikişînin... ***Hevpeyvîn / Bahadîn Akhan /R.4***

## Çalakiyên grevê didomin

Çalakiya greva birçîbûnê ya li dijî tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirina mafên girtiyan ku di 27'ê Mijdara 2020'î de li girtîgehên Tirkiyeyê û Kurdistanê hatibû destpêkirin 242 roj in didome. Çalakiya greva birçîbûnê ya li dijî tecrîda ku 22 sal e li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirina mafên girtiyan ku di 27'ê Mijdara 2020'î de li girtîgehên Tirkiyeyê û Kurdistanê hatibû destpêkirin bi koma 47'emîn didome. Penaberên ku li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dimînin jî bi heman armancê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiribûn. Çalakî 204 roj in didome. Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ), Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê (TJK-E) û Navenda Çanda Kurdistanê pêşengiya çalakiyê dikin. Li Kampa Penaberan a Mexmûrê, jinan... ***R.3***

# Kedên winda

Fatêxan Taşli Tunç

Jinên bermalî; dayik, hevjîn, rêncber, bêrîvan, hilêbî, qerwaş, nanpêj û aşpêj... Di karê hundir û derve de pîbar û kedkar...

Sibê zû bi stêrka şivanan re sêpiyê li dar dixe. Ne kilek, ne du kil û ne sê kil...

Heft kil dew dikêle, berî ku roj hilê...

Xweydana li ser eniya wê ya ku bi deqê şîn hatinê xemilandin weke morîkan digindirin nava biskên badayî. Û di paş guhan de xwe berdidin ber bi jêr ve.

Çavên hêşîn dibiriqin wek sitêra şivanan. Her dem bi kar e lê bê ziman û zar e.

Dixebite bi şev û roj.

Ne ratip ne meaş û ne pere.

Tev li ewqas ked û kêferat dîsa jî dibêje jina malê:

"Jina ber malê me. Ma qey ê ku ez dikim jî kar e? Yê zehmet karê mêran e. Li welatê me zivistan gelek dijwar e. Jiyana zivistanê zehmet e û bihar dereng tê herêma Serhedê. Ew zehmetî jî dikeve ser milê mêran."

Bûka malê ducanî ye, hemla xwe vedişêre dibin fistane xwe yê koderî de. Bê zar û ziman e.

Deng şerm e...

Û ken eyb e...

Evîn şerm e, gazin şerm e.

Ji razana wê re hê çar meh maye. Rûyê xwe dipêçe, bi kefîka hemaî. Çavên şermok, her li erdê dinêrin.

Û nêrîn şerm e...

Pêçîkên qerisî, li ser mircanê gerdenê digerin.

Mistek hêvî.

Mistek evîn.

Mistek şerm.

Û mistek hêrs.

Bi hevre heval in di dilê şermok de.

Êdî derbihar e, dema zayîna xwezayê ye. Hêdî hêdî berf dihele li zozanê Feraşînê. Wê êdî toxim bişkuvin û bibezin ser rûyê erdê, bi tivincê zayînê...

Bihar e li zozanê Feraşînê. Bêrî du dan in êdî. Kevaniyên malan hilêbî û bêrîvan in.

Jin xwedî mêvan û gêdan in. Şêrejin in nav giran in. Ew jîn e, ew jin e, ew jiyan e, lê qedrê keda xwe nizan e. Her çiqas barê mal û malbatê li ser milê wan be jî ked winda ne. Stûxar û dilşikestî ne.

Wan bi sed salan kedek bêhempa dane, lê mixabin ev keda wan a buha ne ji hêla wan ve, ne jî ji hêla mêran ve hatiye dîtin.

Xwezî van stûnê jiyanê yê qewîn bizanibûna ku piştevaniya wan tune be, ew ê ekl û tahma jiyanê jî tune be. Ew nizanin ku destarê jiyanê, bi destê wan tête gerandin.

# Muzîk xilasbûn e!



Sozdar Koçer

**Muzîkê ji aliyekî ve Estherê bi fizikî ji mirinê xilas kir, bi ruhî ji dîmenên li ber çavan xilas kir û cihûyên kampê bi muzîkê çûn mirinê. Dîsa dipirsim, muzîk kê ji çi xilas kir?**



Di jiyana me ya rojane de li her dever û di her riyê de, rêhevalê me yê herî nêz muzîk e. Di her kêliyên xweş, nexweş û tenêtiyê de em muzîkê dikin şirîkên hest û bîranînên xwe. Ew bîranîn û hestên erênî û neyînî xurtir dike – an em di xemginî, tenêtî û qahrê de dixeniqin an jî di kêfxweşî, hezkirin û coşa jiyanê de bi bask dibin. Lê em tik û tenê vêya derbas nakin, lewre her bi muzîkê re, ji ber ku ew şêwazeke mirov bikaribe bêyî xwe îfade û hevokan bi lêv bike, xwe têde bibîne û hîsa fêmkirinê hebe. Mirov dikare bi riya muzîkê xwe ji fikran, cîhanên takekesî û çerxa derdorê qut bike û pê re xwe ji kêliyên jiyanê û fikran xilas bike.

Xilas bike? Kê ji çi!? Van pirsan ji xwe dikim, dema çîroka muzîsyena cihû dixwînim, çîroka Esther Bejerano.

Esther Bejerano di sala 1924'an de li Saarlouis a Almanyayê ji dayik dibe. Keça malbatek cihû ye ku li Almanyayê dijîn. Mîna gelek mînakên din ên malbatên cihûyan, ew jî dibin qurbaniyê guherînên li Almanyayê di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de. Malbat tu pêşerojek ronî êdî li Almanyaya naziyan nabîne û plansaziya xwe dikin ji bo sirguniya Filistînê. Di sala 1941'an de rewş çiqas diçe dijwartir û qirkirin zêdetir dibe ku sirguniya wan pêk nayê. Di wê salê de Estherê 17 salî ye. Di heman salê de dê û bavê wê ji aliyê naziyan ve tên kuştin, piştî salek xwişka wê jî li Auschwitzê tê kuştin û Estherê di kampên kar ên naziyan de tê bicihkirin. Di sala 1943'an de êdî Estherê jî dibin kampa tunekirinê ya Auschwitzê. Li kampa tunekirinê nazî di hewldana avakirina orkestrayekê de ne ku ji keçên cihû yên kampê pêk tê.

Estherê ji ber ku bi piyanoyê dizanibû xwe li orkestraya keçan qeyd kir û dest bi leyistina akordyonê kir. Tevî 40 keçên cihûyan naziyan orkestrayek li kampê ava kir. Dema girtiyên cihû ji kampê bi darê zorê li pey hev diçûn cihên kar, vagonên trênê bi cihûyên ji Ewropayê digihiştin Auschwitzê, cihûyan bibirina daristanên bêveger an jî derbasî cihên gazê – mirinê bikirina, ev orkestra mîna muzîka di ber dîmenekî film an belgefilmî de, dileyist. Ev keçên cihû demek direj bûn şahidê qirkirina mirovên xwe. Çi dîmenek sosret e ne wisa, enstrumanek di destê te de be û tu di ber kuştina mirov, xizm, cînar, heval û hezkiriyê xwe de muzîkê lê bixî û tu nikarî tu tiştek bikî, nikarî dev ji lêdana muzîkê berdî, ji ber ku leşkerên naziyan bi sîlehên gule li ber, li pişt te rawestiya ne. Ji bo tu neyê kuştin, tu bênavber li muzîkê dixî û hewl didî xwe ji mirinê xilas bikî.

Muzîk ji aliyekî ve Estherê bi fizikî ji mirinê xilas kir, bi ruhî û derûnî ji dîmenên li ber çavan xilas kir û cihûyên kampê bi muzîkê çûn mirinê. Dîsa dipirsim, muzîk kê ji çi xilas kir?

Di heman salê de Esthera nexweş dikeve û nikare êdî di orkestrayê de cihê xwe bigire. Nazî wê dişînin kampa jinan a Ravensbrückê û li wê derê 2 salan di kampa kar de dimîne. Di bihara 1945'an de nazî ber bi têkçûyînê ve diçin, Esther û hevalê xwe ji kampê direvin û amerîkî wê herêmê ji naziyan xilas kirin. Piştî têkçûyîna giştî ya naziyan, êdî gelek cihû berê xwe dan Amerîka û Filistînê. Li wê derê Estherê bi cih bû û piştî du salan tev li orkestraya xebatkaran a Israilê dibe û dizewice. Piştî 15 salan ew tevî malbata xwe dîsa vedigere Hamburga Almanyayê û li Almanyayê di gelek grub û orkestrayan de muzîka xwe berdewam dike û tev li rêxistina antîfaşîst dibe. Ew li her dibistan, panel, qad û saziyên civakî û siyasî, behsa serpêhatiyên xwe dike û nifûsên nû ji bo tiştên bûyî hişyar dike û her ji ciwanan re dibêje: "Hûn ne berpirsiyarê tiştên bûyî ne. Lê hûn xwe sûcdar dikin, dema hûn di der barê vê demê de naxwazin tiştekî bizanibin."

Ev jina têkoşer ku bi muzîka xwe bênavber li ber xwe da di 10'ê tîrmeha 2021'ê de çû ser dilovaniya xwe. Jina ku ji xwe re soz dabû û digot: "Ez ê bistrêm, heta di cîhanê de naziyek nemîne" koça dawî kir. Êdî divê em bi berdewamî bistrên heta naziyek, faşîstek û nijadperestek li cîhanê nemîne.



Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

# Hestiyarî: Têgeheke xwezahî yan avakirineke civakî?

"Jin ji mêran hestiyartir in" angaşteke ku ez bawer im, hem ji hêla gelek jinan ve û hem jî ji hêla gelek mêran ve tê pejirandin. Heta zanist jî pirî caran heta roja me ya îro bi vê pêş-pejirandinê tevgeriyaye. Bêguman bi vê gotine kes nabêje ku mêr bê hest in, an jî ne hestiyar in, zêdetir tê xwestin ku bi vî awayî hestiyarbûna jinan derkeve pêş.

Têgînên jinbûn û hestiyarbûnê ji nêz ve têkildarî hevdu tên pênasekirin. Ji ber vê yekê tê gotin ku dubendiya navbera hestiyarî û rasyonalî yekser girêdayî dubendiya jinbûn û mêrbûnê ye. Ji aliyekî ve bi vî awayî wêneyên zayendî yên di hişê me de rûniştine (stereotyp), nêrîna ku jin û mêr du zayend û bûyînên ji hev cuda, xwedî taybetmendî û şiyanên cuda ne, kûr dike; li aliyê din, ev têgihiştin fonksiyonên rola zayenda civakî ji nû ve ava dike. Angaşta ku dibêje jin li gorî mêran hestên xwe hîn kûrtir dijîn û kûrtir bi derdora xwe didin hestkirin, di gelek xebatên zanistî de jî hatiye îdîakirin. Ev lêkolîn bi giranî baweriyên nav civakî yên der barê cudahiyên zayendî de piştrast dikin. Lê li gorî hîn lêkolînan jî di jiyandin û bilêvkirina hestan de, di navbera zayendan de cudabûn hema bêje qet nîne, yan jî gelek kêm e. Divê li vir mirov kevanekê veke û wateya hestyarbûnê jî bo zayendan careke din raxine pêş çav. Nexwe wekî min di serî de jî got, ne ku tê gotin mêr bê hest in; hest jî tên dubendîkirin. Wek mînak hestên xurt û bihêrs bi zayenda mêr ve tên girêdan; û yên jar û dilzîz jî bi jinan ve tên girêdan. Li gorî lêkolînên ku li ser vê pejirandinê diçin, wek mînak jin bi hestên girêdayî têkiliyên civakî tên vegotin. Hestên girêdayî kesayeta xwe bi neyînî (şerm, fedî) û hestên girêdayî derî xwe, yên derveyê xwe bi erênî (sempatî, spasdarî) pênase dikin. Li aliyê din li gorî van lêkolînên ku li gorî baweriyên zayendî yên di nav qalib de mane, mêr hestên girêdayî kesayeta xwe bi awayekî erênî (serbilind û bixwerazî) û yên derveyî xwe neyînî (hêrs, dijminatî) pênase dikin. Li gorî van lêkolînan jin û mêr bi awayekî vekirî di jiyandina hestan de ji hev pir cuda xuya dikin.

Heta vê derê çarçoveya ku hatiye dayîn, li gorî baweriya di mêjiyê me de rûniştiye, dimeşe. Lê lêkolînên ku bi rexneyî li vê cudabûnê dinêrin, di xebatên xwe de digihîjin encamên cuda. Ango li gorî van lêkolînan jin û mêr der barê bûyereke zindî de hestên xwe wekhev nîşan didin. Wek mînak ji jin û mêran tê xwestin ku li bûyerekê bişopînin û der barê bûyerê de hestên xwe bînin ziman. An jî bi xwe di nav bûyerê de ne û dîsa ji wan tê xwestin ku hestên xwe bi lêv bikin. Di dawiya van lêkolînan de tê dîtin ku jin û mêr di gelek çavdêriyên xwe û nêrînên xwe de hestên wekhev nîşan didin û bi lêv dikin. Lê dema wext ji ser bûyerê re derbas dibe û di demek şûn de der barê bûyerê de nêrîn û hestên wan tê xwestin, tê dîtin ku jin û mêr ji hestên ji hev cuda dibêjin. Her du zayend jî dema behsa bûyereke derbasbûyî dikin û hestên xwe tînin ziman, li gorî qalibên zayendî tevdigerin. Lêkolîner girêdayî vê ceribandinê digihîjin vê encamê: Dema bûyer di wê qasê de biqewime, zayendên jin û mêr kêm zêde hestên wek hev (tirs, hêrs, sempatî, dilşewatî û hwd.) nîşan didin. Lê ger bûyer berê qewimî be, jin û mêr ji hev cuda hestên xwe vedibêjin. Li gorî lêkolîneran di vê vegotina hestan de qalib û baweriyên zayendî dikevin dewrê. Ango em bibêjin jineke der barê bûyereke de, di wê qasê de hesteke bi 'hêrs' jiyabe, du meh şûn ve dema behsa bûyerê bike, hestê xwe bi 'dilşewatî' pênase dike. Halbûkî di wê kêliyê de dilşewatî hest nekiriye. Lêkolînêr dibêjin ku jin di bin bandora rolên zayenda civakî de 'dilşewatî'yê derdixin pêş. Hem jin hem jî mêr di vegotinên xwe de –pirî caran bêzanebûn- li gorî rol û taybetmendiyên ku li wan hatine birîn, tevdigerin. Mirov li gorî civakbûna xwe hestên xwe bi lêv dikin. Heta dijîn jî. Ev tespît me dibe mijara 'avakirina hestiyariyê'.

Catherine Lutz di salên 1990'î de li gorî lêkolînên xwe yên der barê xwecihiyên Amerikayê de digihijê vê encamê; hest konseptên çandî ne û nikarin wek têgînên gerdûnî biyolojîk bên pênasekirin. Di lêkolînên xwe de dibîne ku li çand û civakên ne rojavayî de hest cuda tên bilêvkirin. Hest gorî wê di van civakan de girêdayî çanda civakî, xwecihî û heta wek pratîkên îdeolojîk tên avakirin. Li gorî Lutz dubendîkirina hestan îcadeke rojavayî ne. Li cîhana bakur taybetmendiyên hestiyariyê li zayendan tê dabeşkirin; wek pêvajoyên kesan, xwezahî û biyolojîk tên nasandin. Lutz li ser rexneya vê yekê konsepteke hestyariyê pêş dixe û hestyariyê wek pratîkên vegotinî û danûstendinên civakî dinirxîne. Di vê konseptê de armanc li dijî dubendîkirina hestan û zayendan e ku têkiliyên newekhev ên civakî bi vî awayî hîn kûrtir dike, jiholêrakirin û têgeheke nû ji bo hestiyariyê avakirin e. Di vê têgeha nû de ya pêwîstî ew e ku hestên ji bindestbûnê re bûne sedem, bibin bingeha bihêzbûnê û guhertina civakî.



## Çalakiyên li dijî tecrîdê didomin

Çalakiya greva birçîbûnê ya li dijî tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirina mafên girtiyan ku di 27'ê Mijdara 2020'î de li girtîgehên Tirkiyeyê û Kurdistanê hatibû destpêkirin 242 roj in didome. Çalakiya greva birçîbûnê ya li dijî tecrîda ku 22 sal e li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirina mafên girtiyan ku di 27'ê Mijdara 2020'î de li girtîgehên Tirkiyeyê û herêmê hatibû destpêkirin bi koma 47'emîn didome. Penaberên ku li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dimînin jî bi heman armancê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiribûn. Çalakî 204 roj in didome. Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ), Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê (TJK-E) û Navenda Çanda Kurdistanê pêşengiya çalakiyê dikin. Li Kampa Penaberan a Mexmûrê, jinan di 18'ê Kanûna 2020'an de çalakiya greva birçîbûnê daye destpêkirin. Çalakiya ku li Komeleya Malbatên Şehîdan a Mexmûrê dest pê kir, di roja 220'emîn de didome. Girtiyan piştî salvegera berxwedana 14'ê Tîrmehê çalakiya xwe derbasî dorvegera 15 rojan kir.



## Bi bendan sînorên nû xêz dikin

Tirkiye piştî ku bi dîwarê şermê yê bakur û rojavayê Kurdistanê ji hev qut kir, niha jî li Wanê li ser sînorê bakur û rojhilatê Kurdistanê hem diwar lê dike û hem jî xendekan dikole. Bi vî awayî hem tevgera zindiyan asteng dike, hem jî mafê jiyanê binpê dike. Tê texmînkirin ku pereyên ji bo lêkirina dîwar jî ji Yekîtiya Ewrûpayê (YE) hatibin stendin di çarçoveya pêşîgirtina li penaberan de. Dîwar we paşê bigihîje dîwarê ku wê ji Bazîdê biçe heta bi Colemêrgê. Ji bo vî karî Tirkiye bi şirketên hevkar blokên betonê dide çekirin. Yek yek ji van blokan 3 metroyan bilind û 2 metro û 80 santîman bi ber e. Li navçeya Wanê Çaldiranê niha 63 kîlometro xet tê kişandin û dagirkeran heta niha bihevvekirina 3 kîlometroyan temam kiriye. Di heman çarçoveyê de Tirkiye 110 kilometro xendek da kolan û 103 bircan ji bo kontrola optîk hîna çêdike. Ev hemû jî bi rêya pîşesaziya eskerî ya dewletê tên kirin.

Li aliyê din tixûbê navbera Tirkîyê û Îranê 295 kîlometre ye û heta niha li Agirî li ser sînorê Îranê 81 kîlometre dîwar hatiye danîn.

# Lînç çanda dewletê ye

**Di rojên dawî de êrîş û lînça li dijî kurdan zêde bûye. Di êrîşa li Konyayê de Hakîm Dal kuştin. Bertekên li dijî van êrîşan jî zêde dibin. Têkildarî lîncê Civaknas Azad Bariş diyar kir ku lînç perçeyek çanda dewletê ye û amûreke kontrol û serdestiyê ye**

M. Elî Ertaş

Di rojên dawî de li Afyon, Konya û Enqereyê 3 êrîşên cuda pêk hatin. Di êrîşên nijadperest ên 3 salên dawî de 4 ciwan qetilkirin û zêdeyî 10 kurd birîndar kirin. Li gorî rapora ÎHD'ê ya 2020'an li dijî kurdan 14 êrîşên nijadperestî pêk hatin. Di êrîşan de 3 jê zarokên sûriyeyî bi giştî 7 kes hatin kuştin. 32 kes birîndar bûn. Ji sala 2010'an ve 280 êrîşên nijadperestî pêk hatin. Di van êrîşan de 15 kes hatin qetilkirin. 1097 kes jî birîndar bûn. Herî dawî di 21'ê tîrmehê de li navçeya Meram a Konyayê 60 kesî êrîşî malbata kurd kir. Hakim Dal ê 43 salî qetil kirin. Di 21'ê tîrmehê de li navçeya Altindag a Enqereyê êrîşî malbatek kurd kirin. 2 kes bi giranî 4 kes birîndar kirin. Di 19'ê tîrmehê de li bajaroka Dereçîne ya navçeya Sultandagi ya Afyonê êrîşî karkerên kurd kirin. 7 karkerên kurd birîndar kirin. Di 17'ê tîrmeha 2021'an de li Îzmirê êrîşî avahiya HDP'ê kirin. Denîz Poyraz qetil kirin. Di 12'e gulana 2021'ê de li navçeya Meranê ya Konyayê êrîşî kurdan kirin. Di 4 îlona 2020'an de li Sakaryayê êrîşî 16 karkeran kirin. Di 12'ê gulana 2021'an de li navçeya Meranê ya Konyayê êrîş kirin.

**Êrîşek bi organîze ye**

Têkildarî êrîşên nijadperest ên li dijî kurdan û nasnameyên din pek tên, Civaknas û nivîskar Azad Bariş ji Rojnameya Xwebûnê re nirxandin kir. Azad Bariş, diyar kir ku beriya sedema van êrîşan fehm bikin û bidin fehmkirin, divê ew karekterê rejîma Tirkiyeyê fehm bikin ka li ser bingeheke çawa hatiye avakirin û wiha got: “Divê em berê xwe bidin serê sedsalê ka wextê dewleta tirk hatiye avakirin, rol û mîsyoneke çawa li gel/milet/civakê hatiye barkirin. Dîskorsa yekparebûna dewlet-miletê encameke çawa derxistiye meydanê û tirkîfîkasyoneke çawa afirandiye. Di vir de pêvajoyeke cotalî heye. Li aliyekî alavên dewletê yên ku rê li ber vê pergalê vedikin, li aliyê din jî karekterê civakê bi xwe di vê pêvajoyê de roleke sereke û karîger dilîze. Lewre mirov tiştên ku diqewimin wek ‘êrîş’ pênase neke dê baştir be. Tiştên diqewimin ji ‘êrîşan’ wêdetir, xwe dispêrin rastiyeke organîze, riza û teşwîqa dewletê an rayedarên dewletê. Lewre jî mirov li şûna ‘êrîş’ê têgeha ‘lînç’ê bi kar bîne, ew ê meseleyê baştir ronî û rave bike.”

**2 sedemên êrîşan hene**

Azad bariş bal kişand ser sedemên lînça li dijî kurdan û wiha aşkere kir: “Helbet du faktorê lincê hene. Faktora yekemîn xwe dispêre rastiya rasîzma/nijadperestiya strukturel/binyadî. Di serê sedsalê de netewe-dewleta tirk li ser formulasyoneke yekparêz hate avakirin. Ew jî tenê tirkbûn û sunîtî bû. Ji bilî wê hebûna tu gel û pêkhateyan nehat qebûlkirin. Pêşî ên din hatin vederkirin, krîmînalîzekirin û mixabin tunekirin. Paşê jî bi awayekî organîze rastî polîtîkayên tunekirin, asîmîlasyonê hatin. Lê di vê pêvajoyê de kurdan li ber xwe dan.

Faktora duyemîn jî xwe dispêre rewşa aktûel/rojane ku ew jî li ser geşedanên polîtîk teşe digire û li gorî atmosfera serdeman diguhere. Di serê sedsalê de ermenî, di salên 1950'yan de rûm, di salên 1970-80'yan de komûnîst û elewî, di salên 1990-2000'an de jî kurd û penaber rastî van êrîşên organîze, pogrom û lînçan hatin û îro jî tên. “

Azad Bariş anî ziman ku bi awayekî giştî û bi kurtî paşxaneya lînçan a li Tirkiyeyê xwe dispêre çarçoveya nijadperestî û wiha lê zêde kir: “Em baş fehm dikin ku kurd îro çawa û çima tên lînçkirin û kuştin. Nemaze îro tifaqa AKP-MHP'ê ji vê potansiyela ‘hêza gel’ sûd werdigire. Lê ev meseleyeke bingehîn e ku CHP jî di nav de ye. Çimkî em ta ji tecrûbeya Naziyan li Almanyayê dizanin ku lînç, parçeyekî îdareyê, amûreke kontrol û serdestiyê ye.”

Azad li ser slogana ‘kurd û tirk xwişk û bira ne’ jî rawestiya û ev tişt got: “Wek dîskors xwişk û biratî ne tiştekî xerab e. Lê têkiliyên neteweyan, li ser esasên xwişk û biratiyê nikare bê avakirin. Dema mirov li arkeolojiya vê dîskorsê (xwişk û biratî) dinihêre, mirov dibîne ku ev dîskors di berdewamiya serdestiyê de roleke sereke dilîze û ji bo kamûflekirina serdestiyê tê bikaranîn. Motîvasyona lîncan ne tiştên şexsî an malbatî ne. Hem hiqûq hem burokrasî û çapemenî hem jî karekterê perwerdehiya neteweyî ya li ser esasên tirkbûnê ava bûyî, rê li ber vê pergala rasîst-etnîsîst vedike, wê rewa, heq û asayî dike. Êrîşên sîstematîk ên ku li dijî kurdan, penaberan û pêkhayetên netirk tên kirin xwe dispêre rastiya cudabûna wan pêkhateyan. Ji bo wê jî wextê ku kurd bi kurdî biaxivin, HDP'yî bin, mûzîka kurdî guhdar bikin, wê demê rastî êrîşên sîstematîk û lînçan tên. Ev yek nîşaneya herî mezin a karekterê civakî û rasîst e. Mînak wextê mirov li detay û naveroka lînçan li Tirkiyeyê dinihêre mirov dibîne ku lînç jî wek parçeyekî rejîmê û wek amûreke birêvebirinê ye. Ji bo wê jî li Tirkiyeyê gotinên wek ‘her tirk wek leşker ji dayik dibe’ vê nêrîn û pratîkê dermale û bi hêz dike. Kesên ku bi vê motîvasyonê di vê tedrîsatê re derbas dibin xwe wek parçeyê miletekî ‘şervan’ dibînin û dijminatiyê li hemû pêkhateyan dikin. Ji bo wê jî îro li bajarê kurdan



‘malbat’ an ‘şexs’ekî tirk ji ber aîdîyetên xwe yên neteweyî, ji ber axaftina tirkî nayê lînçkirin, vederkirin an kuştin. Balkêş e ku kurd, elewî, ermenî, penaber, LGBT+yî anku kesên ne tirk û kêmar, bindest tên lînçkirin.”

Bariş li ser rol û rista rêxistinên civakî jî rawestiya û wiha got: “Hem raya giştî hem civaka sivîl hem perwerdehiya neteweyî hem jî sazî û dezgehên Tirkiyeyê di meseleya lînç û êrîşên sîstematîk de mixabin parçeyekî hişmendiya damezirîner a serdestiya dewletê ne. Bertekên wan hem têr nakin, hem jî aliyê organîze û sîstematîk ên êrîşan vedişêrin an manîpûle dikin. Helwesta wan rastiyê berovajî dike. Ev yek jî hevahengiya dewlet û rêxistinên civaka sivîl û partiyên ‘muxalif’ bi awayekî zelal nîşan dide. Bi vî awayî wan êrîşên dike tiştekî asayî, ji rêzê û parçeyekî jiyana komaleyetiyê. “

Bariş li ser hêza kurdan jî rawestiya û wiha berdêwam kir: “Helbet piştî bihêzbûna têkoşîna kurdan li Tirkiyeyê hin aliyên demokratîk hin saziyên sivîl ên mafên mirovan û hin tevgerên civakî û partî li dijî van êrîşan têkoşîneke hevpar bi kurdan re dimeşînin lê têkoşîna wan hê jî nikare rê li ber lînçan bigire. Bi taybetî jî di van salên dawî de, hema hema li her bajarekî tirkan, kurd rastî êrîşan tên. Mekanîzmaya ‘peymana bêdengiyê’ lînç wekî tiştekî rewa û rojane tê qebûlkirin.

Li Tirkiyeyê mafya, çete û hêzên kûr û qirêj jî êdî bi awayekî aşkera cih digirin. Di encamê de jî rengvedana wê ya li ser civakê gelek bi xetere ye û rê li ber van êrîşên sîstematîk vedike. Partiyên muxalif jî bûne parçeyê vê pêlê. Li dijî vê helbet divê hemû îmkanên hevpar ên li dijî van polîtîkayan bên avakirin.”

Bariş li ser helwesta darazê jî sekinî û wiha got: “Di meseleya lînçê û êrîşên organîze de helwesta darazê jî girêdayî helwest û polîtîkaya hikûmetê ye. Dema em li êrîşên organîze yên ku di encamê de hin kes hatine kuştin dinihêrin em dibînin ku faîlên van êrîşan her tim ji aliyê darazê ve hatine parastin. Piştî pêvajoya aştiyê hat bidawîkirin û di 6 salên dawî de, faîlên êrîşî kurdan kirin û di encamê de kurd kuştin nehatin cezakirin. Tiştê ku li bajarê kurdan bi destê leşker û polîsan tê kirin, li bajarê tirkan jî bi destê civakê û komikan ve tê kirin. Kurd ji ber nasnameya xwe ya neteweyî rastî êrîşan tên loma jî divê helwesta xwe ya li hemberî wê jî li ser wî esasî ava bikin. Helwesta partiyên kurdan mixabin helwesteke qels e, lewre nikare rê li ber êrîşan bigire.

Divê partiyên kurdan tenê ne di meseleya lînç û êrîşên sîstematîk de lê di hemû meseleyên xwe yên neteweyî de bi awayekî yekpare tevbigerin.




## Malbata Şenyaşar li pey edaletê ye

Emîne Şenyaşar ku hevjîn û 2 kurên wê ji aliyê xizm û parastvanên Parlamenterê AKP'ê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yildiz ve hatin kuştin tevî kurê xwe Ferît Şenyaşar, ‘Nobeda Edaletê’ ya di 9'ê adarê de dabûn destpêkirin di roja 139'an de didomînin. Malbata Şenyaşar ji bo daxwaza edalet, heq û hiqûqê pêk bê di çalakiya xwe de bi biryar û israr in. Biryarin heta encamê têbikoşin.Heta niha gelek caran hatin binçavkirin û bi astengiyên polîsan re rû bir û man. Li aliyê din gelek sazî û rêxistinên civakî ji bo piştgiriyê bidin malbata Şenyaşar ew li pêş edliyeya Rihayê ziyaret kirin. Piştgiriyê ji bo malbata Şenyaşar didome.

## ÇANDA KURDÎ QÊRÎN Û PISTEPISTA KURDAN E

# Potansiyela kurdan xurt e

Bahadîn Akhan

*Her roj em pê dihesin ku kesekî biyanî dixwaze fêrî kurdî bibe û bêhtir xwe nêzî kurdan bike. Ji Arjantînê bigirin heta Japonyayê, li heft parzemînan kurd bala cîhanê dikişînin ser xwe. Bêguman sedemên vê yekê hene. Me jî bi lêkolera polonî Joanna Bochenska re xeber da. Ew bi xwe jî yek ji wan kesan e ku bi têra xwe kurd e û xebatên xwe li ser kurdan dike. Ka em bi hev re guh bidin çîroka Joanna û ji bergeha wê ve li xwe binihêrin.*

**Tu dikarî piçekî behsa xwe bikî?**

Ez lêkolînera polonî me. Dema min li Moskovayê dixwend min kurd nas kirin. Dû re bi wan re hatim bakurê Kurdistanê. Cara ewil bû ku min bajarên Kurdistanê yên wekî Mêrdîn, Riha, Bêrecûkê dît. Bala min pir kişandibû û dû re min biryar da ku ez zêdetir bêm û biçim.

Di sala 2004'an de min biryar da ku ez li ser babeta nasnameya kurdî û wêjeya kurdî teza xwe ya doktorayê binivîsim. Ez di Zanîngeha Jagiellonian a Krakowê de hatim qebûlkirin. Bi vî awayî di çarçoveyeke fermî û akademîk de lêkolînên min dest pê kirin.

Min wê gavê beşa ziman û çanda kurdî qedand. Lê ez di eslê xwe de pisporê çanda rûsî bûm. Bi saya rûsî ez ketim nav çanda kurdî. Teza min li ser nasnameya kurdên bakurê Kurdistanê bû. Ango min dixwest bidim nîşan ka vê nasnameyê di edebiyata kurdî de çawa reng vedaye. Min di destpêkê de edebiyata kurdî ji ser wergerên tirkî xwend, lê dû re min hêdî hêdî kurdî xwend. Pêra pêra jî min bêhtir kurd nas kirin û niha dema ez têm Kurdistanê ez bi piranî bi kurdî diaxivim.

Li Polonyayê me çend proje li ser kurdan çêkirin. Me di bin banê zanîngehê de lêkolînên xwe berfirehtir kir. Her wiha ji bilî lêkolînê ez carinan jî ji edebiyata kurdî wergeran dikim. Çîrokên kurdî ji arşîva malbata Celîlan di 2014'an de. Sala çûyî jî min kurteçîrokên Mehmet Dicle wergerandin polonî. Ez dixwazim di siberojê de Mem û Zîna Ehmedê Xanî jî wergerînim polonî.

Niha jî ez serokatiya du projeyên navneteweyî yên der barê kurdan de dikim. Yek li ser avakirina mîrasa kurdî û zindîkirina ziman û çanda kurdî ye. Ya duduyan jî li ser çalakiyên jinan li ser hemwelatiya alternatîf ku kurd çêdikin.

**Te got piştî fêrbûyîna te ya ziman pêwendiya te ya bi Kurdistanê re jî her çû xurttir bû. Gelo çi te motîve dike an jî dibe sedem ku tu bi kurdan re eleqedar bibî?**

Ji ber ku ez lêkolînereke polonî me, ji derve me, xebatên min jî biyanî dimînin. Lê belê ez difikirim ku di navbera kurd û poloniyan de tecrûbeyên hevpar hene. Mesela hîs, fikr û rewşa kurdan ji min re nas tê. Min bi xwe ev jiyane. Di dîroka neteweya min de heman tiştî hatiye jiyîn.

Ji bilî vê yekê ji ber ku dayîka min tatar bû ez bi xwe jî ji neteweyeke kêmîne me. Ez di nava misilmanan de jî mezin bûme. Misilmantiya tataran ji ya Rojhilata Navîn cudatir e û piçekî dişibe ya kurdan. Ez xwe wek parçeyeke ji dinyaya îslamê dibînim.

Sedema eslî ya xebatên min ew e ku kurdan, çanda wan, zimanê wan bala min kişand. Min xwest ez zêdetir nas bikim. Dûre min xwest teza xwe ser wan binivîsim. Îro jî ev berdewam e. Gava têm Kurdistanê û pêwendiya min bi mirovan re çêdibe û ez wê zindîbûnê dibînim, ez dibînim ku di nav şert û mercên dijwar de kurd ber xwe didin û karê xwe dikin ev yek tesîrekê li min çêdike. Lê belê ne tenê berxwedana wan. Di çanda kurdî de hem motîfên pêkenînê hem jî yên xemgîniyê têkelî hev bûne, tevliheviya wan tiştekî pir estetîk e. Yanî çanda kurdan çandeke bi potansiyel e. Ji bo çanda cîhanê bi xwe jî potansiyeleke wê ya zêde heye. Li Ewropayê kêm kes li ser vê yekê dixebite, ez jî bûm yek ji wan kesan. Ji ber vê yekê jî ez kêfxweş im.

**Te di navbera salên 2013-2018'an de projeya Deng çawa dikare bê bihîstin. Berdewamî û guhertinên çand û realiteya civakê yên kurdî di perspektîfên postkolonyal de bi rê ve bir. Tu dikarî behsa naveroka vê projeyê bikî?**

Me bi 4 kesan dest bi vê projeyê kir lê piştre me bi 6 kesan bi dawî kir. Her kesek li ser babeteke cuda xebitî. Lê bana vê projeyê li ser perspektîfa postkolonyal bû ku çawa mirov piştî tecrûbeyên dagirkeriyê dikarin dengê xwe bigihînin dinyayê da ku bê bihîstin. Ne tenê di mijara şoreş û berxwedanê de her wiha li ser gotara wan bi xwe, li ser formên siyasî yên ku ji bo kurdan hewce ne jî diviya bihata fikirîn. Rewşa kurdan bi giştî, rewşa akademiyê û rewşa çanda wan pir zêde di bin tesîra siyasetê de maye. Divê çand ji bin siyasetê derkeve û bikaribe rola xwe bileyîze. Yanî hem rola siyasî bileyîze hem jî rola xwe ya xweser bileyîze. Siyaseta çandê ji siyaseta siyasetvanan cudatir e.

Di çarçoveya vê projeyê de; min li ser guhertinên sîstema exlaqî di nav çand û vegotina kurdî de lêkolîn kir, hevaleka min li ser avakirina saziyên çandî yên li çar parçeyên Kurdistanê û diyasporayê kar kir, hevalekî din li ser karê mîsyoneran yên di sedsala 19'emîn û encamên wê yên di nav kurdan de xebatên xwe pêş xistin, hevalekî din li ser koçberî û pelên koçberiya kurdan û nexasim ji bo Stenbolê xebitî, hevalekî din li ser meseleya êzidiyan lêkolîn dikir, hevalekî din li ser pêwendiya kurd û krîstiyanan li başûrê Kurdistanê lêkolînan kir. Ev babetên nû bûn, nehatibûn lêkolînkirin. Perspektîfa postkolonyal banek e ji bo van hemû babetan ku dikare wan bi hev ve girê bide.



Gava têm Kurdistanê û pêwendiya min bi mirovan re çêdibe û ez wê zindîbûnê dibînim, ez dibînim ku di nav şert û mercên dijwar de kurd ber xwe didin û karê xwe dikin ev yek tesîreke mezin li min dike

**Di heman demê de dêhn û bala te li ser jinên kurd e jî û tu li ser wan jî xebatên xwe pêş dixî. Portreya jinên kurd a di hiş û dilê te de çêbûye portreyeke çawa ye? Ku tu behsa jinên kurd bikî tu çawa behsê dikî?**

Heta îro min zêde li ser rewşa jinan lêkolîn nekiribû. Di projeya ewil de ez li ser sîstema exlaqî xebitîbûm. Min dît ku di çanda kurdî ya tradîsyonel de sîstemeke girêdayî têgehên şeref, namûs û zayendê serwer e. Yanî şerefa mêran cuda ye, şerefa jinan cuda ye. Lê ez difikirim ku bi çanda nûjen a kurdî û guhertinên civakî jî wateya şerefê diguhere. Armanca wan vegotinên berê yên em ji folklora kurdî dizanin ew bû ku dîmenek û têgihîştinekê ji bo vê şerefê çêbikin. Yanî van çîrokan tenê bala mirovan nedikişand ser xwe, di heman demê de ev vegotin dibûn sedem ku nirxên exlaqî yên taybet bên ferqkirin û hebandin.

Niha bi saya çanda nûjen jî têgihiştina şerefê cudatir e. Edî jiyan bi xwe wekî nirxekê tê dîtin û wekî rûmet tê pejirandin. Ev yek ji bo jinan û mêran jî eynî ye. Wateya evînê bi xwe diguhere: Evîndarî ji bo jiyanê tê afirandin. Bi awayekî hişmend çêdibe. Digel vê yekê portreya jinan jî diguhere. Berê rola jinan girêdayî têgihiştina namûsa wan bû. Eger jinekê bixwesta cihê wê di nav vê civakê de diyar bibûya, lazim bû ku ew cesûr bûya. Ew gotina pêşiyan a dibêje: 'Şêr şêr e çi jin e çi jî mêr e' li ser vê yekê dihat kirin. Niha ev gotin wekî nîşaneya wekheviyê tê pejirandin û nîşandan. Di eslê xwe de rola gerîlayên jin jî wekî berdewamiya wê çandê tê dîtin. Yanî ji bo ku jin 'wekî' mêran bên dîtin û hesibandin lazim e pir wêrek be. Ev jî sebebeke çandî ye ku jin beşdarî nav gerîlayan bûne; ji bo ku azad bibin, ji bo ku ev civak wan nas bike û qebûl bike.

Lê niha jiyan diguhere, êdî jin ne tenê bermalî ne, ne tenê gerîlayên wêrek in. Êdî ew dixwazin ji bo xwe kar peyda bikin, mêjî û potansiyela xwe di warên dîtir de jî bi pêş ve bibin. Ev guhertineke pir mezin e û êdî di nav kurdan jî şopên wê dixuyê. Jin êdî bêhtir çalak in, di akademiyê de, di hunerê û warên din de cih digirin û bi vî awayî ew jî xwedî li rûmeta xwe derdikevin. Ez girîngiyê didim vê dîmenê.

Divê em piçekî jiyana jinên dîtir jî nîşan bidin. An jî jiyanên dîtir yên jinên kurd. Ne tenê şerê wan yên li ser çiyayan. Bila qada wan a rojane jî bê dîtin. Yanî bi zarokan re, bi malbatên xwe re û di qadên xwe yên profesyonel de jî bên dîtin. Bêguman tesîra pergala patrîarkal li ser jiyana wan heye, lê jinên kurd jî pir aktîf in. Xwedî li jiyana xwe, li rûmeta xwe derdikevin. Ez her car behsa vê yekê dikim. Ez zêde li ser mexdûrbûna jinê ranawestim.


**Tu dikarî piçekî behsa wê potansiyela çanda kurdan bikî? Kurd çima nikarin wê potansiyele derbibirin û rêbaza derbirîna vê potansiyelê çi ye?**

Ji ber rewşa şer û pevçûnê, serweriya atmosfera siyasî kurd pir dehumanîze bûne. Ew aliyên din yên wan nayên dîtin. Potansiyela wan ya di warên din de dernakeve holê. Erê serxwebûna xwe dixwazin lê ji bo çi serxwebûn û azadiya xwe dixwazin. Ew ê ji bo vê çi bikin? Ji bo ku dinya tevde bikaribe bersiva vê pirsê peyda bike divê der barê kurdan de zêdetir xwedî agahiyan be. Ne tenê şer, pevçûn û penaberiya wan bizanibe.

Her wiha bi saya edebiyat, sînema, resim û warên dîtir ve dikarin hestên xwe û derûniya xwe bidin naskirin. Bedewiya çanda xwe, potansiyela çanda xwe ya ji bo çanda cîhanê dikarin bidin naskirin. Bi vî şiklî jî ew dikare tesîrê bide siyasetê. Mesela li vir, li Tirkiyeyê tirk qet naxwazin bi çanda kurdan re eleqedar bibin. Ji ber ku tu bibêjî kurd tenê şer û pevçûn û pirsgirêk tên bîra wan. Lê li derve em dikarin fersendên din jî çêbikin. Em dikarin gelê kurd ji şer cudatir, bi dîmen û awayên din jî bibînin.

Mesela ez nimûneyekê bidim. Piştî min ev çîrokên di arşîva malbata Celîlan de wergerandin polonî û çap kir, hevala min, xwediya weşanxaneyê bi van çîrokan çûye fuareke Polonyayê ya ku li ser edebiyata zarokan bû. Ev pirtûk jî bi wêneyên pir xweşik hatine çapkirin. Weşanxaneyeke tirk hatiye pirsiye ka ev çi ye. Dema bihîstiye ku çîrokên kurdî ne, pir şaş maye. Xwestiye ku van çîrokan bi tirkî jî çap bikin. Yanî şaş mane, li derveyî welatê wan tiştek bala wan dikişîne, xweşik e, lê dibînin ku ev bi kurdî ye. Heke em bikaribin li derve gelek fersendên bi vî rengî çêbikin ew jî dikare di siberojê de tesîreke baş li vê rewşa xerab a li Tirkiyeyê bike. Ji ber ku li Tirkiyeyê avakirina van fersendan, yanî rewşa hevnaskirina her du gelan, ya rastî ji aliyê tirkan ve naskirina kurdan tune ye. Siyaseta li Tirkiyeyê destûra vê yekê nade. Lewma jî di vê kurd girîngiyê bidin warên dîtir jî. Ez dibînim ku nifşê kurdan yê nû jî bêhtir bi van waran re eleqedar dibe. Ev jî hêviyê dide. Armanca lêkolîn projeya me jî ev bû: Me dixwest ku em bi perspektîf û nêrînên cuda li kurdan binêrin û vî dengî bidin bihîstin. Mecaza vê rewşê jî ev e: Ji bo bihîstina vî dengî jî carna qêrîn carna jî pistepist lazim e.

## Joanna Bochenska kî ye?



Ji nav malbateke tatar li Krakowa Polonyayê ji dayîk bû. Li Zanîngeha Jagiellonian a Krakowê xwend û li Akademiya Filman a Moskovayê de wekî lêkoler xebitî. Li ser kurdan û rojhilatnasiyê xebatên xwe bi pêş dixe. Wekî rêvebir di çend projeyên li ser kurdan û çanda wan de xebitiye û niha jî serokatiya projeyên heman rengî dike. Di heman demê de ji kurdî bo polonî wergeran dike û wênekêşiyê dike. Gelek caran rêya xwe li Kurdistanê dixe û çavdêriyan dike.

# Dikim ku ‘roman’ekê bikujim



Yaşar Eroglu

Romaneke Firat Ceweri heye, navê wê ‘Ez ê Yekî Bikujim’ e. Di sala 2008’an de li Stenbolê ji nav Weşanên Avestayê derketiye, ji 147 rûpelan pêk tê.

Roman ji du beşan pêk hatiye. Divê her beşek bi serê xwe jî bê nirxandin. Di beşa yekê de teşeyê romana Dostoyevskî Sûc û Ceza û lehengê wî Raskolnîkov hatiye ceribandin. Di vê beşê de lehengê sereke ‘Ez’ e. Lehengê Firat Ceweri ‘Ez’ bi awayekî qels dişibe Raskolnîkov. ‘Ez’ ê jî yekî bikuje lê weke Raskolnîkov micîd nîne. Rasko gelek li ser çalakiya xwe difikire, ka wê amûra kuştinê çawa dest bixe ji xwe re dike xem. Lê xema ‘Ez’ê nîne, kêreke metbexê dike amûra kuştinê. Çima kêra metbexê, lê ne yeke kujer, ew pirs li hewa dimîne. Pereyên wî hene, du kîlotên jinan belasebeb dikire, diçe Dîanayê re bikeve xelwetê pere dide, yanî pirsgirêk ne pere ye.

Di ‘roman’ê de xema teknîka honaksaziyê tune ye. Ew li pey tiştekî din e. Min ji bo bêcidiyetê, navê lehengê wî danî Eznîkov; şibandiyê Raskolnîkov. Eznîkov Raskolnîkovê kurd e lê fason e. Armanca kuştina yekî di berhemê de nîne. Kî were pêş dixwaze bikuje, heta diya xwe jî lê ecêb e kesî nakuje. Hingê pirs hewce dibe, armanc kî û çi ye? Ji ber çi ew qas nediyar î? Em di herka romanê de fêr dibin ku nivîskar xwestiye hêmaya kuştinê bike amûreke pêlîstok a ji bo gihîştina Dîanayê. Ji ber ku mifteya romanê Dîana ye. Berî ku em werin ser mijara Dîanayê divê ez çend tiştan raxim ber çavan.

Eznîkov panzdeh salan di girtîgehê de maye û derketiye derve. Belasebeb bûye dijminê Amedê û amediyan. *“Ev bajarê ku berî panzdeh salan em ji bo rizgariya wî rabûbûn, niha, piştî panzdeh salan êdî bi awayekî eşkere ji bo têrkirina zikê xwe keçên xwe difiroşe.” (rp.32) “Navê bajêr jî guherandine. Hinan ji wan navê bajêr ê berê li xwe kirine. Ev nav ji xwe re kirine nîşana mêrxasiyê. Lê tirsonek di siya mêrxasiya bajêr de dijîn.” (rp.30) “Ew ji ber xwe ve nayên û nabêjin ku ez ji bo rizgariya warê wan panzdeh salan di hepsan de mame; nayên bi destên min nagirin, di ber dilê min nadin, dilên xwe naspêrin dilê min û laşê xwe ên bedew pêşkêşî min nakin.* (Amedê weke kerxaneyekî dibîne û hûn pê dihesin bê amedî ji bo wî çiqas ‘bêşêkirandî’ ne(!)”(rp. 31) Weke pêkenokên Kemal Sûnal lê di eslê xwe de karesat û întihara Firat Ceweri ye. Çima ewqas dijminahî û heqaret li Amed û amediyan?

Firat Ceweri dike nake nikare xwe ji Eznîkov veqetîne, bide aliyekî. Gava Eznîkov pênase dike û dikeve têkiliyan, xwe terîf dike. *“Bila nebe mîna pesnekî, ez ji gelekî ji wan spehîtir im û kincên min ji ên wan xweşiktir in.”(rp. 34) “Ma tu ji kîjan koma rewşenbîran î?” (rp.43) “Dizanim ew li ser min dipeyivin, lê berê xwe min venakin û naxwazin bi kirinên xwe bala min bikişînin.” (rp.47) “Mamoste, hûn jî ji bo festîvalê hatine?”*(rp.51) Kesekî ku mehek e ji girtîgehê derketiye rastî ewqas dilxweşkirinan tê, enteresan!

Eznîkov ji kuştina yekî xwe avête pastexaneyekê, pê rê di odeyeke ‘hotel’ê de xwe bi Dîanaya fahîşe ya tazî û rût re rû bi rû dît. Ji bo cidiyetê ranexe erdê xwe ji minasebetê re radigire û guh dide dilê Dîanaya xemgîn. Fahîşe dibe jineke liserxwe, birûmet û xwedî exlaq. Lê bîst deqan berê hatibû ser maseya Eznîkov û wî gotibû, “Meraq dike bê ez oral, anal, an jî vajinal dixwazim.” (rp. 66) Nakokiyeke mezin. Dîana dibêje, “Ez dixwazim ji vê jiyanê xelas bibim.”(rp. 70) Û Firat Ceweri mifteya ku derî veke ji xwe re diafirîne.

Jixwe nivîskar bingeha kuştina Eznîkov amade kiriye, ew nexweş e, carinan xwe ji bîr dike. Wê yekser bi xwe bikeve dewsa Eznîkov. Bi vî awayî perdeya beşa yekê tê girtin.

Hema di serê beşa duduyan de Eznîkov rastî qezayeke trafîkê tê û dimire. Hûn li vê tesadifê binêrin niştecihê Ewrûpayê nivîskar Firat Ceweri yê ji bo konferansekê hatiye Amedê di taksiyê de ye. Ji bo ku Firat Ceweri bi xwe biketa serê govendê divê Eznîkov bimira.

Kaxizê nîşeyê yê ji bêrîka Eznîkovê rehmetî derketiye, di destê Firat Ceweri de ye, Dîanayê digere û dibîne. Meger Dîanaya fahîşe, gerîlayeke berê ya PKK’ê bûye. De hûn li vê tesadifê binêrin! Û kêlên serboriya Dîanayê dibişkivin heta wê kêliyê tên. Ji Firat Ceweri jî dixwaze, “Tu yê min xelas bikî ne? Tu yê min ji vê dojehê rizgar bikî?” Û prensê xilaskar ê porspî yê ser pişta hespê boz ji xwe re rê rewan dike. Divê gerîlayeke ku PKK bûye sedem, bibe fahîşe, bilewite Firat Ceweriyê xwedî îdeolojiya kadûk xilas bike, ne yekî/e din.

Çîroka Dîanayê balkêş e. Ji Ewropayê diçe akademiya Libnanê. Li Botanê dikeve destê artêşa tirk. Serheng tiştekî jê re nabêje wê serbest berdide û çavdêriya reva wê bixwe dike. Dîana dikeve destê qoriciyan, qorîcî weke xwîşka xwe lê dinêrin, xwarin û vexwarinê didinê, namûsa Dîana ji qoriciyekê tecawizkar diparêzin. Serqoricî dibêje, *“Me rahiştiye sîlehan, lê heqê me nîne ku em bênamûsiya bikin, dest bavêjin namusa xelkê…”* (rp.137-138) Nivîskar bi yek derbê dewleta tirk û qoriciyan dişo, paqij dike û textîmî kurdan dike: Kurdino ji artêşa tirkan netirsin, ew dost in ên ji rê derketî şoreşgerên kurd in. Şervanino werin teslîm bibin îşkence tune, deriyê pêş re digirin ê paş re berdidin, fikaran nekin.

Serqoricî Dîanayê li trimpêlekê siwar dike, dişîne. Nivîskar ji bo Dîanayê bike fahîşe ji nişkê ve senaryoya romanê diguherîne. Di şert û mercên asayî yên ew qas qencî lê kiribin de divê berdin nav civakê lê na, wisa nabe. Dîanayê radestî hêzên herî kujer û dirinde dikin. Bi dehan caran tecawizî Dîanayê dikin û Dîana dibe fahîşe, berdidin nav bajarê Amedê. Ev rûpelên dawî fînal û kakilê romana F. Ceweri ne. Tev peyamên wî tê de veşartî ne.

Firat Ceweri biryar dide ku bibe prensê xilaskar ê Dîana yê. Lê ji nişkê ve deriyê odeya Firat Ceweri re Eznîkovê kuştiyê trafîkê dikeve hundir. Di destê wî de kêreke bixwîn êrîşî wî dike. Destikê telefonê ji destê wî dikeve, kêr dikeve erdê. Mirov nizane Firat Ceweri mir an ma, çi bû. Bi awayekî nepen, ‘roman’ bi awayê Dostoyevskî dest pê dike, bi terzê Nanaya Emîle Zola dewam dike, bi terzê Alfred Hîtchcock dawî dibe. Ev jî enteresan e.

Honaksaziya ‘roman’ê hemû hêmayên ku ji bo PKK’ê nirxên bilind in, kiriye armanc. Amedeke têkçûyî, girtîgeheke têkçûyî, şerekî têkçûyî, jineke têkçûyî di ‘roman’ê de derxistine ser dikê. Jixwe dilê Firat Ceweri yê ji çil salan zêdetir ev hesret tê de veşartî maye ew yek nedixwest? Ji bo di kûrhiş de be, di hestan de be jî carekê bi riya romanê ev tolhildan ne bes e?

*Ji bo ku ew jî bibûya prensê xilaskar ê ser pişta hespê boz, Dîana* xilas bikira û bi riya ‘roman’ekê bi namûsa Dîanayê re bûya, weke ku namûsa PKK’ê bin pê bikira çima kêm serkeftinek bû ji bo wî?

Kî dikare bêje ev roman e? Belge û wesîqayeke reşkirinê ye ya ku mîna bernameya Ertûrk Yondem ‘Perde Arkasi’ ya salên 90’î, pirtûkên reşkirin û îftirayê yên JÎTEM’ê bi navê îtirafkaran dihat weşandin. Wî wêje kiriye amûra kûrhiş û îdeolojiya têkçûyî û mirî pê dilê xwe rihet kiriye. Ketiye bin sîwana romanê, xwestiye hesabê ku nikare bi riya îdeolojiya têkçûyî veke bi vî awayî bigihîne encamê. Zelal e, ne ji bo berhemeke wêjeyî binivîse, ji bo toleke dêrin a hê ji sûkên Dêrikê mayî destê wî çûye ser klavyeyê.

Mînakeke hişk e ku roman û wêje çawa erzan tê qurbarnkirin ji bo siyaset, hest û kûrhişê takekesî.






Samî Hêzil

## Çîroka Wezîrê Nadirî

Di şîrovekirina deqên wêjeyî de nirxandina di ser nivîskêr re rêbazeke kevn e bes hê jî derbasdar e. Jiyana nivîskêr, tecrube û helwestên wê/wî ji bo şîroveyên me dibin pîvan. Lê mesafeya navbera berhemên wêjeyî û nivîskarên wan jî divê neyên jibîrkirin, an ku nivîskar û berhem teqez ne yek û heman tişt in. Rexnegirên wêjeyî timî dijwariya têkildarkirina metnê û nivîskarên wan anîne ziman. Lewre xwendina metna edebî ya li ser nivîskêrên wan di sedsala dawî de cihê xwe ji xwendina navend-metnî û navend-xwînerî re hişt. Dîsa jî nivîskar hê jî faktoreke referans e ji bo nirxandina berhemê. Têkiliya nivîskêr û berhemê bi tercîha cureya edebî, bi şêwaza nivîsînê, bi ton û hewaya berhemê û bi helwesta nivîskêr xwe dide nîşan. Kesayet, jiyan û ezmûnên nivîskêr tev li ser tercîha wê/wî ya cureya wêjeyî, li ser şêweya nivîsînê û li ser mijarên ku tercîh dike tên nîqaşkirin.

Dema min der barê jiyana Wezîrê Nadirî de hin tişt xwendin û pirtûka wî ya bi navê Nûbar nirxand, ez dîsa li ser têkiliya jiyana nivîskar a bi tercîhên wî yên wêjeyî re mijûl bûm. Em bi çend gotinên der barê Wezîrê Nadirî de behsê vekin. Nadirî di temenekî biçûk de sêwî dimîne û di nav kuştin û qirkirinên salên 1916’an de ji gundê xwe yê qeraxa gola Wanê koç dike û berê xwe dide (Qafqaz) Kavkazê. Wezîr perwerdehiya li ser ziman û edebiyatê, bi taybetî jî edebiyata farsî dibîne. Dibe serokê beşa îranî ya rêxistina îstixbarata Sovyetê û têkiliyên dîplomatîk li gel Qazî Mihemed û rêvebirên Komara Kurdistanê çêdike. Heta tê gotin ku Wezîrê Nadirî pîlaneke sûîqastê ya li dijî Stalîn aşkera dike û bi saya wî Stalîn ji kuştinê rizgar dibe. Di mirina Nadir de jî hin angaştên cuda hene. Li gor agahiya fermî di sala 1946’an de di qezayeke trafîkê de dimire. Lê li gor agahiyên ku Eskerê Boyik ji kesên wek P. Mihoyî û Kînyazê Îbrahîm radigihîne, Wezîrê Nadirî piştî hilweşîna Komara Kurdistanê bi awayekî nepen tê kuştin. Her wekî tê zanîn Wezîrê Nadirî li heyama şerê duyem ê cîhanê bi ser navê rêxistina îstixbarata Sovyetê û wek kurdekî welatperwer têkiliyên berfireh li gel Qazî Mihemed û kesayetên din datîne û di avakirina Komarê de xwedî rol e. Di encamê de jî reng e ku wek berpirsekî tevgera kurd a wê demê û wek kesekî xwedî zêdeagahî hatibe kuştin.

Berhema Wezîrê Nadirî, Nûbar, cara yekem di sala 1935’an de ji aliyê Neşra Hikumeta Ermenîstanê ve li Rewanê tê weşandin. Pirtûk hem bi versîyona çapa yekem û hem jî bi tîpguheziya latînî ji aliyê Weşanxaneya Nûbiharê ve di sala 2016’an de hat çapkirin. Di Nûbarê de helbest û çîrok hene. Çîroka destpêkê ya bi navê “ÇAXIRBEGÊ DA” hêmanên çîrokên dedektîfî dihewîne. Li destpêka çîrokê vebêj-leheng dikeve li pey şopa Dara Maşûr ku atmosfereke nepeniyê û hewayeke sosret çêdike di çîrokê de. Dîsa vebêj bi heman helwesta dedektîfî devê hin bûyerên paşerojê vedike. Çîroka kelefê xaniyê Hamê, ku li destpêka çîrokê wek şûnwareke bixof ji xwîner re tê pêşkêşkirin, bi diya xwe dide gotin û pê re jî bûyerên din tên vegotin. Bûyerên wek kuştina birayê xwe, karesata ku li ser mala Hamê çêdibe û zordariyên ku Elî beg dide kirin, reva leheng a ji gund û pîlansaziya wî û dergîstiya wî Têliyê ya der heqê kuştina Arif Begê de tev dirûvê çîroksaziya dedektîfiyê didin.

Tiştekî aşkera ew e ku Wezîrê Nadirî bi awayekî rasterê lehengê çîrokên xwe ye. Vêca mirov li ser jiyana Wezîrê Nadirî ya di salên 1940’î de bifikire ku bi têkiliyên kompleks ên siyasî û dîplomatîk, bûyer, belge û şahidiyên nehînî jiyaneke bi têra xwe têkilhev e; û wan tiştan jî bi bûyerên ku 20-30 sal berê pêk hatine û bûne mijarên çîrokên wî yên salên 1930’yî têkildar bike, hingê rê û peywendek ji bo hin şîroveyan vedibe, helbet dibe ku ew şîrove wek zêde-şîrove bin jî. Tiştê ku di vê nimûneyê de bala min kişand ji tercîha Nadir a cureyeke edebî bêtir -lewre camêr helbest, çîrok û pîyes jî nivîsîne- têkiliya navbera mijara çîroka wî, honandina bûyeran, atmosfer û tona vegotinê û qedera wî ya şexsî bû.

Jiyana Wezîrê Nadirî, tercîha wî ya cureyî û şêweya afirandinên wî bi vê deqbendê dikare rêça şîroveyên me yên edebî diyar bike. Gelo Wezîrê Nadirî bûyerên zaroktiya xwe di xortaniya xwe de ku wek ofîserekî îstixbaratê kar dikir, ji nû ve honand û reng û dirûvên bûyerên paşerojê bi çavê îroya xwe ji nû ve hevrêst? An bûyerên heyama zarokatiya wî wek pêşbîniya xirab (premonition) a çarenûsa wî li ber çavên wî xuya bûn û jê re bûn hêmanên çîrokî? Dibe ku Wezîrê Nadirî serpêhatiya xwe ya 20 sal berê bi dawiya xwe ya 20 sal şûn de di nav çîroksaziya çîrokekê de gihandibe hev û bi rêya efsûna edebiyatê dawiya xwe hîs kiribe û ew nivîsîbe. Rêya pirs û şîroveyên bi vî rengî vekirî ye û xwîner dikarin mijarê hin zêdetir veçirînin eger ku konteksta şîroveyê kifşe be. Jixwe tiştê ku qîmeta wêjeyî ya berhemekê çêdike jî ew bêserûbiniya şîrove û pêhisînan e.

# Kurd êdî ne faktor aktor in

Navenda Nûçeyan

**Hevserokê KNK'ê Ehmed Qeremûs diyar kir ku mirov pirsa kurd û çareseriya wê nikare li gorî 10 sal berê muqayese bike û got: "Kurd berê faktor bûn lê niha aktor in."**



Kongreya Neteweyî ya Kurdistan (KNK), bi armanca yekitiya neteweyî ya gelê kurd pêk bîne û di nava partî, sazî, kesayet û rêxistinan de hevsengî, yekrêzî û yekdengiyê çêbike, demeke dirêj e xebatan dike. Hevserokê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Ehmed Qeremûs têkildarî girîngiya yekitiya neteweya kurd û xebatên ku KNK dimeşîne ji rojnameya me re nirxandinên girîng kir.

**Konjûktûra 100 salî ya navdewletî**

Hevserokê KNK'ê Ehmed Qeremûs ewilî bal kişand ser siyaseta navdewletî û wiha got: "Siyaseta navdewletî bi taybetî li Rojhilata Navîn gihiştiye wê qonaxê ku li herêmê dizayneke nû ava dikin. Li her çar parçeyên Kurdistanê pirsa kurd û çareseriya wê mirov nikare li gorî 10 sal berê muqayese bike. Niha rewş cuda ye. Kurd êdî ne faktor in. Êdî bûne aktor. Bêguman dost û hevalbendên me û hêzên ku piştgiriya me jî dikin hene. Hinek hêz jî li gorî berjewendiyên xwe tev digerin. Em jî siyaseta navdewletî û konjûktûra di 100 salên dawî de didin ber çavan. Ji bo me parastina berjewendiyên gelê kurd gelekî girîng e. Parastina van berjewendiyan, yekitî û hevkariya gelê kurd e. Em bawer dikin ku KNK weke saziyeke neteweyî û sîwaneke neteweyî di wê erk û misyonê de ye û ji bo wê têdikoşe. Danûstandin, hevdîtin, munaqaşe û xebatan di her warî de dike."

**Girîngiya yekitiya neteweyî**

Qeremûs diyar kir ku eger weke sîwaneke neteweyî vê qonaxê di asta siyaseteke neteweyî û navdewletî de nikaribin li ber çavan bigirin; dê di erkên xwe de bi ser nekevin û wiha axivî: "Eger em rastiya vê pêvajoyê bi hevûdu nedin qebûlkirin dê derfetên ku îro di destê me de ne biçin. Em haziriyên vê qonaxê dikin ku di çarçoveya pêkanîna stratejiyeke neteweyî de li hev bikin û xebatên xwe bidomînin. Di vê qonaxê de her çiqasî ji aliyê siyasî, dîplomasî û civakî ve hinekî ferq di navbera me de hebin jî divê em li pêş yekitiyê nekin asteng.

Em di demên dawî de bi vê erka xwe gelekî serwext in. KNK, bi israr û îradeyeke xurt ji bo yekitiyê xebatan dike. Her çend hinek alozî li pêş me hebin jî em gelekî hêvîdar in ku em ê wan derbas bikin. Ev jî dê bi diyalog û hevdîtinan pêk bê."

**'Yekitî di asta gel de pêk hatiye'**

Ehmed Qeremûs destnîşan kir ku gelê kurd di ferqa girîngiya yekitiyê de ye û wiha got: "Di xebatên KNK'ê yên heta niha de ji her çar beşên Kurdistanê û kurdên li diasporayê gelekî beşdarî çêbûne. Di asta gel de yekitî pêk hatiye. Mirov îro rewşa her çar beşên Kurdistanê, hest, helwest û tevgera gelê kurd li pêş çavan bigire rewşek erênî heye. Mînakê wê hene. Dema ku êrîşên DAÎŞ'ê li başûr û rojavayê Kurdistanê dest pê kirin, jin û xortên kurd gerîla, pêşmerge xelkên welatparêz bi hesteke neteweyî tevî şerê li dijî DAÎŞ'ê bûn û DAÎŞ'ê têk bir. Ev asta yekîtiya gel nîşan dide. Gelê kurd sînorên ku dijmin di nava me de daniye di mêjî û hestên xwe de hilweşandiye."

**'Hinek hêz ji yekitiyê direvin'**

Qeremûs da zanîn ku hinek partî û rêxistinên kurd ji yekitiyê dûr disekinin û got: "Di asta siyasî de hinek alozî û nakokî derdikevin. Hinek partî û rêxistinên kurd tev li karê yekitiya neteweyî nabin. Ji bo pêkanîna stratejiyeke neteweyî astenga herî mezin ew e ku hin partî û rêxistin kurdistanî nafikirin. Di asta herêmî de difikirin. Astenga herî mezin ev e.

**Bi dijminên kurdan re tevdigerin**

Hin hêz û tevgerên kurd li cem dewletên dijminên kurd û Kurdistanê cih digirin. Ev dibe sedem ku ev hêzên kurd beşdarî xebatên bo yekitiyê nebin. Her wiha ev yek bi xwe re xetereyên pir mezin diafirîne. Di asta dîplomasî, aborî an jî weke her kes dikare pêwendiyê li gel hevûdu deynin. Armanca me ne ev e. Em siyaseteke şaş li gel hin partî û rêxistinan dibînin. Em dixwazin ji vê siyaseta şaş vegerin û destkeftiyên xwe bi parêzên."

**'Siyaseta şaş pêşî li dijmin vedike'**

Ehmed Qeremûs bal kişand ser encama siyaseta şaş û wiha pê de çû: "Di salên 2012 û 2013'an de hêviyeke gelekî xurt bi me re çêbû. Ew qonax ji ber siyaseta şaş têk çû. Ev rewşa xetere îro jî derbasdar e. Danûstandinên wan li gel dewletên herêmî berdewam in. Parastina berjewendiyên beşên din ji bo wan qet ne girîng e. Çima kurd parastina berjewendiyên xwe di asta kurdistanî de nafikirin? Dijmin jî ji vê siyasetê sûd werdigirin. Dewleta tirk baş dizane ku li du beşên Kurdistanê destkeftî û statuyeke gelekî berbiçav heye. Dibe ku di aliyê siyasî, stratejî û îdeolojîk de cudahî hebin. Lê ew cudabûna me, fikrên me divê nebin sedem ku em li gel dijmin tevbigerin. Îro tiştê ku li Başûr pêk tê dibe sedem ku dijmin hartir bibe û êrîşan berfirehtir bike.

Heman rewş li Rojava jî heye. Îro li Rojava Rêveberiyeke Xweser heye. Rêveberiya Xweser xebat kir. Bedelên gelekî giran dan. Lê hin hêzên kurd li Rojava xizmeta dijminên kurdan dikin û ev hêz li gel Îtîlafa Sûriyeyê ya naxwaze destkeftiyên gelê kurd li Rojava çêbibe, tevdigere.

**Hêviya me ji her demê xurtir e**

Divê êdî tevgerên kurd di babeta parastina berjewendiyên neteweyî de tevbigerin da ku bibin aktorekî esasî. Baweriyê bidin dost û dijminên xwe. Divê nîşan bidin ku em ji bo parastina berjewendiyên xwe yên neteweyî bi israr, îrade ne û em temsiliyeta gelê xwe dikin. Dengên cuda dibe sedem ku dijminên gelê kurd vê ji bo xwe dikin firsend. Ev jî bo me ziyaneke mezin e. Dê KNK bi israr û îradeyeke xurt xebatên xwe bidomîne. Gelek hewldanên me çêbûn ku em tevgera kurdî bicivînin û yekitiyê ava bikin. Em bi hêvî ne. Em ê heta misogeriya destkeftin û serkeftinê xebatên neteweyî bi rê ve bibin."

**'Divê alozî bên çareserkirin'**

Ehmed Qeremûs têkildarî bernameya KNK'ê ya siberojê jî wiha axivî: "KNK'ê ji bo karê pêşerojê di sê xalan de bernameyek da pêşiya xwe. Yek jê çareserkirina alozî û nakokiyên di navbera hêzên kurdî de ye. Em dixwazin nakokî û aloziyên ku li pêşiya yekitiya neteweyî astengiyan derdixin bi diyalog û danûstandinan çareser bikin û bigihînin encamekê. Ya duyemîn jî em dixwazin xebatên xwe yên dîplomatîk û siyasî berfirehtir bikin ku rewşa gelê kurd bê dîtin û statuya gelê kurd bê naskirin. Ev jî xebatek girîng û esas e me wekî bername daye pêşiya xwe. Wekî xala sêyemîn jî êrîş û dagirkeriya dewleta tirk di van demên dawî de dijwartir û berfirehtir bûne. Tirkiye li ku derê destkeftiyên gelê kurd hebe êrîş dike û dagir dike. Ji bo rawestandina van êrîşan û li dijî dagirkeriya Tirkiyeyê em ê xebatên xwe pêş bixin."

**Li dijî êrîşan bêdeng nemînin**

Hevserokê KNK'ê Ehmed Qeremûs herî dawî ev bang li gelê kurd kir: "Em weke gel di pêvajoyeke hesas û girîng re derbas dibin. Êrîşên dijwar û xeternak li ser gelê kurd û destkeftiyên gelê kurd heye. Em dixwazin gelê kurd li dijî vê rewşê hestiyar û baldar be. Li hember van êrîşan bêdeng nemînin û bikevin nav liv û tevgerê."

## Cara yekem kongreya MXDŞ'ê bi tevlibûna civakên cuda pêk hat

Ev demek e ku amadekariyên Kongreya Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê (MXDŞ) ya 4'emîn dihat kirin. Beriya kongreya giştî, li hemû meclisên gundan di çarçoveya amadekariyên kongreyê de civîn hatin lidarxistin û delegeyên kongreyê hatin hilbijartin. Di encama van civînan de 250 delegeyên ku hatin hilbijartin beşdarî kongreya giştî bûn. Ji oldar û rûspiyan heya hunermend û rojnamegeran ji tevgerên jin û ciwanan heya karker û kedkaran hemû beşên civakê beşdarî kongreyê bûn. Her wiha 50 mêvanên ji derdorên cuda yên civakî jî beşdarî kongreyê bûn. Di nav mêvanan de, êzidiyên ku ji Ewropa û Rûsyayê jî hebûn.

Yekemîn kongreya MXDŞ'ê piştî fermana 2014'an hatibû lidarxistin û wekî bersiva civaka êzidî ya li hemberî fermanê bû. Ji kongreya avakar heya niha her kongre bi armanc û hedefeke pêk hat. Armanca sereke ya 4'emîn Kongreya MXDŞ'ê jî berfirehkirin û xurtkirina meclisa gel û mîsogerkirina Xweseriya Şengalê ye. Kongreya 4'emîn ji bo salvegera fermana 73'an û hemû bîranînên şehîdên fermanê hat lidarxistin.

Ji kongreyên demborî cûdatir, di vê kongreyê de cara yekem civaka mesîhî, şîa û ereb jî hem wekî mêvan hem jî wekî delege beşdarî kongreyê bûn. Ev jî gaveke girîng û dîrokî ye ku hemû pêkhateyên herêmê beşdarî kongreyê bûn.

Bi vî rengî Kongreya Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê, ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkên Iraqê dibe modeleke xurt.

***ŞENGAL***



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Êrîşên 24'ê Tîrmehê û Erdogan

24'ê Tîrmeha sala 2015'an li Kurdistanê pêvajoyek nû dest pê kir. Bi vê pêvajoyê re planên qirkirina kurdan û dagirkeriyê dan destpêkirin. Di vê rojê de dewleta tirk li dijî kurdan şerekî topyekun da destpêkirin.

Artêşa tirk di 24'ê Tîrmeha 2015'an de li dijî herêmên Zap, Xakûrkê û Metînayê êrîşên hewayî da destpêkirin. Ev êrîşa ku bi dehan balafirên şer pêk hat, bi her awayî pêvajoyek nû da destpêkirin.

Beriya vê pêvajoyê di îlona 2014'an de ji aliyê Musteşariya Pergal û Ewlehiya Giştî 'Plana Rûxandinê' hate amadekirin. 30'ê Cotmeha 2014'an jî civîna Desteya Ewlehiyê ya Millî pêk hat û ev plan hat erêkirin. Ev bû civîna herî dirêj a di dîroka dagirkeriya tirk de.

Di vê civînê de biryar hat dayîn ku pêvajoya çareseriyê were qedandin û operasyoneke tasfiyeyê ya berfireh were destpêkirin.

Lê beriya êrişên 24'ê Tîrmehê pêvajoyek hat jiyîn. Di vê pêvajoyê de Rêber Abdullah Ocalan ji bo ku biryara şer a MGK'ê pûç derxîne û demokratîkbûnê têxe rojevê, di mijdara 2014'an de Pêşnûmaya Muzakereya Demokratîk pêşkêş kir. Li ser vê 28'ê sibata 2015'an Mutabaqata Dolmabahçeyê ya bi pêşengiya Rêber Apo li Qesra Dolmabahçeyê hat aşkerakirin.

Lê serokomarê tirk Erdogan di 22'ê adara 2015'an de ji balafira ku ji Ukraynayê vegeriya ji nûçegihanan re axivî û mutabakatê red kir. Bi vê daxuyaniya Erdogan hevdîtinên li girava Îmraliyê hatin qut kirin û Ocalan bi tecrîdek giran re rûbirû ma.

Di vê pêvajoyê de li Tirkiyeyê jî xwe ji hilbijartinên 7'ê hezîranê re amade dikir. Erdogan dît ku eger HDP benda hilbijartinê derbas bike, wê guherîna destûra bingehîn nikaribe pêk bîne. Ev jî li pêşiya hemû plan û projeyên ku dixwaze desthilatdariya xwe xurt bike astengiyek mezin bû.

Ji xwe di encama hilbijartinê de HDP'ê ji sedî 13 deng stend û 80 parlementer şandin meclîsê. Bi dengê HDP'ê, AKP tena serê xwe nebû desthilatdar. Lewma Erdogan ji bo desthilatdariya xwe xurt bike biryara hilbijartineke pêşwext da. Piştî bi 4 mehan dîsa hilbijartin çêbû û AKP'ê xwe kir desthilatdar. Ji bo ku bibe desthilatdar jî serî li hemû rê û rêbazên qirêj da. Di 20'ê tîrmehê de 33 ciwan li navçeya Riha Pirsûsê hatin qetilkirin. Di 10'ê cotmeha 2015'an de jî li Enqereyê di mîtînga aştiyê de komkujî çêbû û 101 kes hatin qetilkirin. Li bajar û navçeyên bakurê Kurdistanê qedexeyên derketina derve hatin ragihandin. 12 bajarên kurdan hatin xerakirin û bi sedan kes hatin qetilkirin.

Operasyonên qirkirina siyasî li dijî demokrat û şoreşgeran pêk hatin. Şaredariyên DBP'ê hatin dagirkirin û di nav de şaredar gelek siyasetmedar hatin girtin. Destnedana parlementerên HDP'ê hat rakirin û 12 parlementer jî rehîn hatin girtin.

Pêvajoya ku hişt Erdogan Tirkiyeyê wisa ber bi xirabûnê û aloziyê ve bibe bi êrîşên 24'ê Tîrmeha sala 2015'an destpêkir. Lewma pêwîstî heye ku dema mirov di roja me ya îroyîn de êrîşên li ser başûrê Kurdistanê û rojavayê Kurdistanê pêş dikevin bizanibe. Ev pêvajoya ku di encama wê de bi hezaran kes hatin qetilkirin, bi milyonan kes ji warê xwe bûn û li çar aliyê Kurdistanê pêşî ji talanê re hat vekirin encama van polîtîkayên Erdogan e.

# Bi Lozanê tovê înkar û îsyanê çandin

Navenda Nûçeyan

Di ser Peymana Lozanê de 98 sal derbas bûn. Bi vê peymanê digotin kurd û tirk yek parçe, mîna "goşt û neynûk in." Vê peymanê bi înkar û feraseta netew-dewletê re Komara Tirkiyeyê ava kir. 98 sal in Kurdistan bûye çar parçe û kurd tune tên hesibandin.

Dewletên di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de bi ser ketin û hikûmeta Tirkiyeyê di navbera xwe de di 24'ê Tîrmeha 1923'yan de Peymana Lozanê îmze kirin. Ji avabûna Tirkiyeyê û vir ve Peymana Sewr a di 10'ê Tebaxa 1920'î de hat îmzekirin wek 'teslimiyet' û Peymana Lozanê jî wek 'serkeftinê' hatin ragihandin. Bi Lozanê re înkar û îmhaya kurdan dest pê kir.

Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Almanya û Împaratoriya Osmaniyan tifaq çêkirin û darbeyek mezin xwarin. Împaratoriya Osmaniyan parçe bû. Di navbera şandeya bi serokatiya Sadrazam Damat Ferît Paşa dewletên di şer de bi ser ketine li Fransayê Peymana Sevrê îmze kirin. Osmaniyan parve kirin.

**M. Kemal soz da kurdan**

Beriya Peymana Sewrê M. Kemal û hevalên xwe derketin Anatoliyayê. Di kongreyên Erzirom û Sêwazê de soz dan ku hemû mafên kurdan û xelkên din bidin wan. Kurdan jî di Şerê Rizgariyê de piştgirî da M. Kemal. M. Kemal û hevalên xwe di serdema Lozanê de wekî ku kurd nas kiribin, daxuyanî dan. M. Kemal li Amasyayê belavokek weşand. Soz da ku ev dewleta hevpar dê ya her du neteweyan be.

Di 23'ê Nîsana 1920'î de li Enqereyê ji aliyê TBMM'ê ve xweseriya kurdan pejirand. Soza xweseriyê dan kurdan. M. Kemal got "Çarenûsa kurd û tirkan yek e."



Di 21'ê mijdara 1922'yan de li Lozanê hevdîtinên aştiyê dest pê kir. Îsmet Înonu û şandeya Tirkiyeyê ya ji 27 kesan pêk dihat çûn hevdîtinê. Parlamenterê Amedê Zulfu Tîgrel Beg jî di nava şandeyê de kurd temsîl dikir. Îngilîzên di serokatiya Lord Curzon de angaşt kir ku Mûsil bajarê ereban e. Heyeta tirkan jî diyar kir ku kurd û tirk wek 'goşt û neynûk in' û dixwazin Mûsil ji wan re bê hiştin. Îsmet Înonu jî gotibû "Hikûmeta TBMM'ê bi qasî ya tirkan e ewqas jî ya kurdan e." Aliyan li hev kir û di 24'ê Tîrmeha 1923'yan de jî Peymana Lozanê îmze kirin û Kurdistan kirin çar parçe. Tirkiyeyê Qanûna Bingehîn a di 1921'ê de pejirand û di nava sê salan de jiyana hemû gelan a hevpar ji holê rakir.

**Kurd bi Qanûna 1921'ê înkar kirin**

Meseleya kurd bi Qanûna Bingehîn a 1921'ê ku wê bê çarserkirin hat diyarkirin. Lê piştî Qanûna Bingehîn a 1921'an bi Qanûna Bingehîn a sala 1924'an re pirsa kurd û hebûna kurdan hat înkarkirin. Kurdan jî li dijî vê serî hildan. Serhildanên Şêx Seîd, Agirî-Zîlan û Dêrsimê pêk hat.

Piştî salên 1970'yî bi pêşengiya Abdullah Ocalan PKK hat damezrandin û pêvajoyek nû dest pê kir. Pişt re bi hezaran gund hatin şewitandin. Bi milyonan kurdan koç kir. Bi hezaran kurd hatin kuştin û windakirin. Herî dawî di navbera PKK'ê û dewletê de di salên 2013 û 2015'an de hevdîtinan dest pê kir. Pêvajo piştî 24 Tîrmeha 2015'an derbasî şer bû.

**Peymana Dolmabahçeyê**

Di navbera Şandeya Îmrali û dewletê de li Qesra Dolmabahçeyê peyman hat îmzekirin. Di şeva 24'ê Tîrmehê de balafirên şer herêma Qendîlê bombebaran kirin û pêvajo bi dawî bû.

**Nirxandinên Ocalan**

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan di nirxandin û analîzên xwe de peymana Lozanê wekî bûyerên herî trajîk a sedsala 20'î pênase kiribû û gotibû: "Bi peymana Lozanê ne tenê petrola Mûsil-Kerkûkê, di heman demê de kurd jî winda kirin.

Ocalan di parêznameya 5'emîn de wiha dibêje: "Neteweparêziya Anatolyayê bi pêşengiya Mistefa Kemal weke tevgera rizgariyê bi gewde bû. Destpêkê îsyaneke li dijî hêzên hegemonîk kiribû bingeh. Di vê tevgerê de kurd û cihû bi rola damezrîner radibin. Tevî xwediyên erdan û eşrafên kurd, sermayedar û kadroyên elît ên cihû, bi hêmanên milletperest burokratîk ên tirk re hevgirtin. Ev hevgirtin di qonaxa damezrandina Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê de dibe û di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de pêk tê. Bi îmzekirina Peymana Lozanê û îlana komarê re qonaxeke nû dest pê dike. Arîşeya Mûsil û Kerkûkê ya bi îngilîzan re dewam dikir, hewl dan bi peymaneke gelekî trajîk a li dijî kurdan bigihînin encamê."

**Nûjenkirina Lozanê**

Ocalan destnîşan dike ku eger kurd û tirk peymana Lozanê nûjen bikin, dikarin di dîrokê de bi ser bikevin û dibêje: "Ev rastiya nû ya derketiye holê, li ser mirov ferz dike ku mirov li rewşa Israîlê ya li herêmê ji nû ve bifikire. Israîl bi tenê dewleteke neteweya cihûyan jî nîne. Beriya Şerê Rizgariyê di salên 1919-23'an de di Tamîma Amasya, belgeyên Kongreya Erzirom û Sêwazê û Protokola Amasyayê de axa Mîsaqi Milî wekî axa hevpar a gelê kurd û tirkan îlan dikin."

**Wek bombeya atomê ye**

Ocalan Peymana Lozanê yek ji bûyerên herî trajîk ên sedsala 20'î pênase dike û wiha dibêje: "Lozan tenê li ser kurd bandor nake, li ser ereb, ecem û tirkan jî bi qasî bombeya atomê bandor dike. Pêşî li Rojhilat bi Peymana Qersê (1921), paşê li Rojava bi Peymana Lozanê yên bi destxistibûn, di 5'ê Hezîrana 1926'an de bi Peymana Mûsil-Kerkûkê bi awayekî stratejîk têkbirin."

Ocalan di roportaja ku di 23-25'ê îlona 1989'an de bal dikişîne ser Peymana Lozanê û wiha dibêje: "Yekitî, têkiliya kesên dişibin hev û wekhev û bi hev re ye. Wekheviya di qada aborî û polîtîkayê de û di mafên neteweyî de bingeha yekitiyê ye. Me got divê em Sewrê û Lozanê jî derbas bikin. Em dê îtîfaqa gelan a demokratîk ava bikin. Gelên li Rojhilata Navîn bi qasî gelê gurd û tirk muhtacî vê tifaqê ne."

Ocalan di hevdîtina 24'ê gulana 2006'an de ya ku bi parêzeran kiribû wiha dibêje: "Piştî sala 1923'an di pêvajoya Lozanê de bi mudaxaleya Îngiltereyê ku di sala 1924'an de Tirkiye bû netew-dewlet, peywira înkarê da tirkan û peywira îsyanê jî da kurdan. Bi vê yekê qeyrana demokrasiyê li Tirkiyeyê bêtir kûr bû û hêj didome."

**Lozanê nûjen bikin**

Ocalan, di hevdîtina 4'ê çileya 2007'an de jî têkildarî peymanê ev tespît kiribûn: "Îro AKP, MHP, CHP û partiyên din ên dişibin wan, bi nijadperestî û yekperestiyê destpêkê berê didomînin. Ocalan, herî dawî di 17'ê adara 2010'an de ji bo çareseriyê ji hikûmetê xwestibû ku li dijî talûkeya Sewrê Peymana Lozanê nûjen bikin û gotibû: "Kurd û tirkan di sala 1920'î de îtîfaq ava kirin. Em li dijî talûkeya Sewrê peymana Lozanê nûjen bikin."



Kurdistan Lezgiyeva

# Bandora Îngilistanê ya li ser Tirkiyeyê

Di nav rojnamevan û pisporên tirk de baweriyeke kûr heye ku tim û tim dewletên kûr ên wekî Israîl, saziyên wekî MOSSAD an Gladîo, civakên veşartî yên wekî Freemasons, Skull and Bones, Rosicrucians, Templars, avahiyên hiyerarşîk ên ku aboriya cîhanê kontrol dikin -baronên darayî yên Wall Street, emanetên neftê, pargîdaniyên pirneteweyî- bi sedsalan li Dewleta Kûr a Îngîltereyê ve hatine girêdan û Îngîltere çalakiyên wan bandor dike.

Li gorî vê, çalakiya siyasî ya ku Rojhilata Navîn di nav xwînê de xeniqandiye berhema Dewleta Kûr a Îngîltere ye.

Piraniya dewletên Rojhilata Navîn ji hêla Îngîltereyê ve hatine avakirin. Sînorên welatên Rojhilata Navîn, di Konferansa Qahîreyê de ya bi serokatiya Churchill li dar ket, hatin xêzkirin. Piraniya serokên van welatan ji hêla Dewleta Kûr a Îngîltereyê ve hatin hilbijartin û li ser peywirên xwe hatin tayînkirin. Nûnerên Dewleta Îngîltereya Kûr, Lawrence, Gertrude Bell, General Allenby, Ord Wingate, Hubert Young, Percy Cox, Herbert Samuel û yên din, ev kadro destnîşan kirin, perwerde kirin û erkdar kirin.

Piraniya kadroyên ku di sedsala 20î de, li Rojhilata Navîn hukum dikirin, di saziyên perwerdeyê yên Îngîltereyê de wekî; Akademiya Leşkerî ya Sandhert, Dibistana Lêkolînên Rojhilat û Afrîkî, Zanîngeha Exeter, Cambridge an Oxford hatin perwerdekirin û ji bo wan hatin tayînkirin, ji meqamên ku ji Dewleta Kûr a Îngîltereyê re xizmetê dikin. Bêguman, di nav dîwarên van saziyên perwerdeyê de, bêhejmar mirovên hêja, dilpak, baş hatin mezinkirin. Lê belê, di heman demê de, tê zanîn ku her yek ji van saziyên perwerdeyê ji hêla Dewleta Kûr a Îngîltereyê ve wekî navendeke perwerdeyê tê bikaranîn. Li pişt derbeya Mossadeghî a li Îranê, derbeyên leşkerî yên li Tirkiyeyê di 1960, 1971, 1980 û 2016'an de, her wiha tevahiya dîroka derbeyên li Misir û Sûriye Dewleta Kûr a Îngîltereyê heye.

**Cîhana Anglo-Saxon cîhanek modernîzm û peymanan e**

Li gorî baweriyeke bi vî rengî, di nav avahiyên mafyayê yên tirk de, ku jê re Dewleta Kûr tê gotin, pêwîst e ku şaxên Dewletên Kûr ên Amerîka, Îngîltere, Îsraîl, Almanya, Fransa, ango avahiyên veşartî û rêxistinên îstîxbaratê yên Rojava hebin. Hemû rêxistinên Masonî, bi dîtina hebûna veguherîn û avahiyên din ên şaxên wisa, hewce ne ku ji bo dewletên kûr ên biyanî kar bikin.

Dîroknas Profesor Îlber Ortayli di konferansa "Di dîrokê de têkiliyên tirk-îngîlîzan" de ya ku li Otela Kensington Hilton hat lidarxistin nirxandinên girîng kir û ev tişt anî ziman:

"Cîhana Anglo-Saxon cîhaneke modernîzm û peymanan e. Îro jî, Dewletên Yekbûyî dewleteke gerstêrkî ye. Ew çavkaniyên enerjiyê yên cîhanê kontrol dike. Lê belê, Îngîltere siyaseta cîhana DY'ê kontrol dike. Dewletên Yekbûyî bi destûra dîplomatên brîtanî biryarên girîng didin. Û bêyî destûra wan û bêyî agahdarkirina wan, ew nikarin gavekê jî biavêjin. Amerîkî tenê li dîplomatên brîtanî guhdar dikin. Pergala îdarî, dîplomatîk û zagonsazî ya îngilîz dê li cîhanê ji bo demeke dirêj hebûna xwe bidomîne. Wezareta me ya derve re, li hember hemû cîhanê, bi Brîtanyayê re tu astengî tune ye. Wekî din, têkiliyên bi wê re hîn jî baştir bûne. "

**Daxuyaniyên Balyozê Îngîltere Richard Moore**

Yekitiya Ewropayê piştî 15'ê tîrmeha 2016'an hewla derbeyê şermezar kir, kiryarên hukûmeta Tirkiyeyê di serdema piştî derbeyê de bi tundî hat rexnekirin. Gelek welatên endamên YE'yê, di hevdîtinên xwe yên bi şandeyên tirk re, mijarên kiryarên neqanûnî yên li Tirkiyeyê û hem jî êrîşên bê kontrol ên li ser mirovên asayî, rojnamevan, leşker, polîs, zanyar û nûnerên pîşeyên din eşkere kirin. Lê belê, di wê mijarê de nêzîkatiyên Îngîltereyê bi girîngî cuda bûn.

Balyozê Brîtanyayê yê li Enqereyê, Richard Moore, di 23'ê tîrmeha 2017'an de li CNN Turk'ê bi zindî bersiva pirsên amadekarê bernameyê Hakan Çelik da û got: "Piştî derbeya 15'ê tîrmehê, Serokwezîra Brîtanyayê Theresa May ferman da min ku ez bi tevahî piştgiriyê bidim hikûmeta Tirkiyê. "

"Li gorî me Tirkiye wekî hevalbendekî NATO'yê bi nirxên Rojava ve girêdayî ye. Tirkiye şirîkê me ye, ku em pir girîngiyê pê didin, ew welatek e ku em wê wekî hevkarekî pir girîng dibînin, hem li vê herêmê û hem jî di asteke pir mezin de. Tirkiye li gelek deverên cîhanê, wek mînak, di pêşveçûna Afrîkayê de rolên girîng dilîze. Li Afrîka, piştî Çînê di karsazî û avahiyê de duyemîn welatê herî bibandor e. "

Di hevpeyvînekê de Moore got: "Em di mijara Suriyeyê de ji nêz ve bi Tirkiyeyê re hevkariyê dikin. Têgihiştinên li ser YPG 'ê li aliyekê, nêrînên me yên li ser tiştê ku divê em bikin da ku em li dijî DAIŞ'ê ser bikin, yek e. Her wiha hewce ye Esed derkeve, dibe ku piştî heyamekê veguhêze, pir dişibe Tirkiyeyê.

Di heman demê de, di mijara çalakiyên bêwext ên der barê ragihandina serxwebûnê de ji hêla kurdan ve, fikarên me yên bi vî rengî hene, da ku ev peyman neyê xerabkirin. Helwesta me di vê mijarê de diyar e; divê em wê bipejirînin. Mafê wan tune ku vê yekê yekalî bikin. Wekî ku min berê jî destnîşan kir, rezervên me hene ku Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê li Iraqê gavên yekalî ber bi serxwebûnê ve biavêje. Ji ber ku ev ne guncan e ku di serdemeke ew qas hesas û xeternak de gavên wiha biavêjin. Bi tevahî, em di mijara Sûriyeyê de bi Tirkiyeyê re ji nêz ve kar dikin û piştgiriyê didin kiryarên wê yên di Operasyona Mertala Firatê de û her wiha hewlên wê yên dîplomatîk ên li dijî rûsan. Tirkiyeyê nîşanî Rûsyayê da ku ew ne dikarin Astana û ne jî pêvajoya Cenevreyê bi kar bînin da ku derbek surprîz bidin. "

**Encam**

Piştgiriya îngîlîzan li pêşiya veguherîna dînamîk bû ku hukûmetê li ser piyan bihêle, lê ragihandina gelemperî bi rengekî balkêş bû. Civaknasê navdar Ali Bulach di xebatên xwe yên destpêkê de teza "piştgiriya bi kadroyên siyasî û îslamî yên welêt re bi yek hêzê" îspat kir.

Di heman demê de rexneyên berfireh li ser awayên cihêreng ên Moore ên danûstendina rasterast bi wezîr û siyasetmedarên AKP'ê re di berbanga darbeya 15'ê tîrmehê de hebûn. Bi rastî, di van salên dawî de pêvajoya piştgiriya Brîtanyayê ya ji bo tifaqa neteweperest Erdogan + Bahçelî bi firehî hate nîqaşkirin.

Fethullah Gulen, di bersiva pirsekê de ku di hevpeyvînekê de hat pirsîn bi dîtina wî, ka kî, li pişt darbeyê bû. Got ku bi îhtîmaleke mezin ev netewperestên ku ketine nav avahiya artêşa tirk bûn. Balyozê brîtanî ev performans wekî êrîşeke dijber nirxand. Ji ber vê yekê bersiva pirsa kî li pişt neteweperestan e hat dîtin.

Armancên îngîlîzan ên demdirêj desteserkirina Qibrisê ye. Parastina baregehên wê yên leşkerî li Tirkiye û deverên nêzîkê wê pirseke din e. Wekî din, gotina Erdogan a ku tê de dibêje: "Em hevserokê Projeya Rojhilata Navîn a Mezin in", nexşeyên îngîlîzan û hevkarê stratejîk ên DYA'yê yên der heqê Qibris û Rojhilata Navîn de bi navgîniya AKP'ê aşkera dike. Ji ber vê yekê, ew piştgiriyê didin AKP'ê û Erdogan. Wekî din, bi polarizasyona din a cîhanê (Brexit), ew Tirkiyeyê jî ber bi şerekî gengaz ve dikişînin.

# Zimanê jinan, otoasîmîlasyon û otomêrzayî

Gulgeş Deryaspî

Derdê zimanên ku di bin bandora kolonyalîzmê de mane û 'jinbûniya parçebûyî' yek e. Ji bo belavbûn û bêqîmetbûniya jinê kronolîjiyeke dîrokî heye, sedem û destpêk hatine vegotin, lê gelek pirs, rexne û vajîgotinên vê mijarê jî hene. Mîtos û logosên li ser vê mijarê têra zelalkirina mijarê nake.Yanî wekî her dîrokê, dîroka têkçûyîna jinbûniyê jî tevlihev e. Lê bi ya min jî êdî hewce nake em dîrokê bikolin, bikolin û bizivirin dîsa bikolin. Çareserî çi ye em li pey wê bigerin. Belê kronolojî sedema encamek girîng e lê çareserî êdî girîngtir e. Ferdînand de Saussure ji bo zanîn û hînbûyîna zimanekî nû dibeje *'ji bo ku kesek bikaribe leyîstika kişikê bilîze, hewce nake dîroka kişikê bizanibe.'* Yanî dema kurdek bixwaze hînê zimanê almanî bibe hewce nake pêşî dîroka ziman û pêvajoyên ku ziman tê re derbas bûne hîn bibe. Axaftinê hîn bibe bes e. Ev jî nêrînek e û derbasî hemû dîsîplînan bûye û hin kesan vê bi pêş xistine û teoriya postbinyadgeriyê derketiye holê.

Jineke li gundekî, ku qet haya wê ji paşeroj û pêşeroja jiyanê tune be jî bi pirsgirekên xwe dizane. Ji malbat û koka xwe cihê dibe, kutana fîzîkî dibîne, dijûn li dê û bavê wê tên kirin, ji mal û milk bê par dimîne. Kîjan zindî van xirapiyên ku min di hevoka beriya vê hevokê de hejmart baş, birûmet, biqîmet û wek madalyayekê dibîne?

Marek bê birîndarkirin, heya heyfa xwe nestîne nasekine. Jin çima bi pirsgirêk û çareseriyên xwe nizane? Kîjan jin e kutan dixwe û dibêje *'elhemdulîllah, çi xweş e. Vî hestiyê jî bişkîne, bila ev diran jî biçe, dijminên xirabtir li diya min bike…* Pirsgirekên jina îro êdî ev nînin rast e, êdî kuştin û mirin e. Gelek jin hene ku êdî di asteke pirsgireka jinbûniyê ya jortir de ne û dibêjin *'êdî kîjan jin kutanê dixwe? Dema kutanê xilas bû, qediya'.* Nexêr heya jin û mêr hînê jiyaneke hevpar nebin, jiyanê bi hev re ava nekin, gotin û çîrokên xwe neguherînin, dê di qedera her mêrî de kujerî, di ya jinê de jî kuştin ranebe.

Pirsgirêka pela femînîzmê ya yekem li ser siyasetê (hemwelatîbûniyê) ava dibe, ya duyem (1960) li ser aboriyê û rolên zayendan (karên belaş ên nav malê, zayenda serdest û bindest û hwd.), a sêyem gavek pêşdetir diçe û hevrengiyê (queer) diparêze. Jineolojî jî asteke nû û destpêkeke nû ye ku em dikarin bibêjin postqueer an jî postpostmodern jî… Ev meş ji Îngilistanê (1972) dest pê dike heya îro ku li hemû cîhanê belav bûye. Helbet aniha jî li Îngilistanê jinên ku ji aliyê mafên xwe ve di asta pela yekemîn de ne jî hene, li Kobanê jinên ku di asta postqueerê (jîneolojî) de ne jî…




Yek ji wan jinên ku serê xwe li ser vê pirsgirêkê êşandiye Sîmone de Beauvoîr e. Di bin bandora felsefeya heyînê de rêyeke nû (postmodern) li jinê vedike û dibêje 'jin nayê cîhanê, jin tê avakirin'. Him bi aliyê başî û him jî bi aliyê xirabiyê ve her tişt ji nû ve tê guherandin û avakirin. Rola jin û mêrê jî wisa ye. Tu tiştek nîne ku nayê guherandin û teqez e. Em pêşî li qedera jinê ya ku dikare bê guhertin binêrin ku çawa ye û paşê vegerine ser ziman û mînaniyên navbera jin û ziman.

Di xwezaya jinê de dayîn heye. Şîr dide. Afirandin heye. Ji bo zarokan aş bike çîrokan diafirîne. Zayîn heye, insanan tîne jiyanê. Nerm e. Ji bo dergûşê sîng û pêsîrên jinê bi konfor e û mêr kevir be jin ax e. Yanî hem bi aliyê fîzîkî û him jî bi aliyê xwezayî ji mêr nermtir e, bêhnfirehtir û bexşendetir e. Erd û axa însan e jin, cihparastin e, yanî cihê ku em xwe dispêrinê. Bila wek propagandaya jinê neyê famkirin lewra li jiyanê her giyanewarek wesfên wê/î û rolekî wê/î yê jiyanê heye û her yek li gorî qedera xwe tevdigere. Helbet di nav vê kategoriyê de mêr û wesfên mêrê jî heye. Lê mijara me ne mêr e. Belê çivîk difire, mar dikaşe, masî soberiyan dike. Jin tîne dinê, xwedî dike, hez dike, qîmet dide, derman dike, star dike. Bila qedera ku me gotî rasterast wek qedera ku em dizanin neyê famkirin. Qedera masiyê di bin avê de ye, ger ji wê derkeve jiyana wê bi dawî dibe. Lê ger masiyek mezintir wê bixwe ev ne qeder e, xweneparastin e. Hatina me ya vê jiyanê, zayend, dê û bavê me tev qeder e. Çimkî em nizanin ka me ev bijart an na. Yanî dervayî tercîha me ye an na em nizanin. Lê bindestbûna jinê qeder nîne, him tercîh e, him darê zorê ye. Darê zorê ya ku bi destê însan tê kirin nabe qeder dibe zilm û zordarî. Çimkî jin kutan nexwe jî dikare bijî, ji nav çar dîwaran derkeve jî dikare bijî, bê mêr jî dikare bijî, lê nikare çil roj bê xwarin û av bijî. Yanê pîvanê qedera wê û mêrê yek e. Serdestiyek, bindestiyek di navbera qedera wan de tune ye. Wê demê çima yek serdest e û yek bindest e? Gelo Sîmon de Beauvoir rast dibêje? Em bi çîrok û logosan yanî bi gotin û çîrokan zarokên xwe dixapînin û qederekî sexte ava dikin?

Peyva 'zimanê' di morfolojiya kurdî de nêrza jî be dîsa ji aliyê gelek pîvanan ve dişibe mêzayê. Ziman ji jinê nayê cudakirin lewra ziman bi xwe ji aliyê jinê ve tê hînkirin, em ji jinekê hînî ziman dibin, bi ziman ve jiyanê nas dikin. Ziman jî dewlemendekî wek dê ye ku her dem dide, xwe bi xwe dizê, nû dibe, diafire, pirceleb e, li hemberî jiyanê bersiv e, di nav xwe de pergalekî bêdawî ye.

Dîsa ziman jî wek jinê nerm e û cihê herî bi konfor wek pêsîrê jinê zimanê zikmakî ye. Nermbûnê em dikarin bi du awayan binirxînin: Yek, bi konfor e, him her dem xwe dispêrin zimanê zikmakî û dudu wek hevîrê nan bi her aliyî ve diçe, dişemite, dilîze, fire dibe, teng dibe lê tu carî hişk nabe. Yanî wek ku di nav gramera kurdî de hatiye bikaranîn nêrza nîne. Hişk nabe ziman, qut nabe, asê namîne, wek avê diherike diçe, mîna jinê dide û hey dide. Lê çima nêrza ye?

Jin jî zimanê kurdî jî qedera wan bi destê zaliman ve hatiye avakirin û em îro hewl didin ku jinên otomêrza bûne û kurdên ku otoasîmîle bûne pê haydar bikin. Em ew kes in ku him jin in û him jî kurd in. Tirk ji kurdan, mêr ji jinan pirs dikin dibêjin ka 'hûn çi dixwazin'. Û dema vê dipirsin bi gotina xwe bersivê jî ava dikin. Yanê dibêjin ku bersiveke rast nedin, heya ji destê we tê tiştên beredayî bibêjin û xwe bi xwe pûç bikin. Lê ger hûn rastiyê bixwazin: Di wir de çavtirsandineke veşartî heye ku him jin, him jî kurd dizanin dê encam çi be.

A baş û a rast em jin jî kurd jî tu tiştî ji tu kesî naxwazin. Çima ku em çavbirçî nînin û çavê me li mal û milkê kesî nîne. Yanî em zimanê tirkî û hêza mêran naxwazin. Em xwe nas dikin, jinbûnî çiye dizanin, qîmeta zimanî dizanin û li gorî van pîvanan dijîn. Ger em xwe bi xwe, yanî bi xwe re, bi zimanê xwe biaxivin û dîsa zimanekî mêzatiyê ava bikin, rolên zaliman ku dane me em neleyzin, ji xwe em dê mafê xwe bi dest bixin. Û her tişt ji nav malê dest pê dike. Ger em pêşî bi xwe re paşê bi xwişk û birayên xwe re bi zimanê xwe bipeyvin pirsgirek namîne. An jî di nav mal û malbatê de dema jinek dinê bê lenetkirin em qayîl nebin dê biguhere, her tişt dê wê demê biguhere. Yanî bila tu jinek li derve li neyarê xwe negere. Neyarê her jinekê an bavê wê an birayê wê an hevserê wê ye. Di nav dîrokê de jinên ku hatine kuştin ji aliyê bav, bira, kur û hevserên xwe ve hatine kuştin. Û ji bo sedemên ving û vala û beredayî. Dema ez dibêjim neyar bila wisa neyê famkirin ku em mêr wek neyar dibînin, berovajiyê vê mêr û kolonyalîstê zimanê kurdî em wek neyar dibînin û hebûna xwe li ser tunebûna me ava dikin.

Pêwîst e em rola xwe ji binî ve bifikirin, binirxînin û nehêlin ku êdî mêrên ku bi hezaran sal in rolê xwedatiyê para wan ketiye biaxivin, fikra xwe bibêjin. Wan fikra xwe zû de gotiye. Hobbes, Platon, Arîsto, Konfîçyus, Kant, Mewlana, Gazalî, Freud û hwd li şûna wan axivîne. Ji ber wê êdî dema axaftina Hobbeswarî, Platowarî, Arîstowarî, Konfîçyuswarî, Kantwarî, Mewlanawarî, Freudwarî, Gazalîwarî û hwd. hatiye.

Çareserî ji nû ve xweavakirin e. Kolonyalîstan zimanê me qedexe kirine û li ser zimanê xwe xebitîne, kolonyalîsta bavkanî jiyan li jinê qedexe kiriye û jiyana ku para jinê ketiye, diyariyê mêrê kiriye. Belê bi kurt û kurmancî pirsgirêk ev e. Ger jin tev bi hev re jiyaneke nû ava bikin dê kolonyalîst bikaribin bikin? Di qad û dîsîplînên cûr bi cûr de, jin di asta zanîneke nû de kar û xebatan dikin, diafirînin, yanî wek ku ji nû ve hatibin jiyanê û çi pêwîst be wî dikin. Dikarin bikin. Hêza jinê heye. Kar û barên pergala kolonyalîzmê ji wan re, jin bila ji nû ve jiyanek nû, mîtoseke nû, logoseke nû, edebiyateke nû, felsefeyeke nû, zanisteke nû, bihevrebûneke nû, civaknasiyeke nû, derûniyeke nû, karê fenî û tibiyeke nû ava bike. Wek ku qet dîrokeke kolonyalîst tune be, mêr tune be. Dikare. Her jinek di qada disîplîna xwe de xwediyê vê hişmendiya jineolojiyê be çima nikare?

Di heman demê de, heman derman ji bo pişaftin û otopişaftina zimanî jî çêdibe. Mamosteyên me bi kurdî, bijîşkên me bi kurdî, pisporên di her qadên zanistan de ger bi kurdî biaxive dibe parçeyeke çareseriyê û barê giran li ser pişta zimanzan û wêjevanan de ye. Pêwîst e xebatên pirtûkî pir zêde bibin. Pir zêde roman, pir zêde helbest, pir zêde pirtûkên lêkolînê, ên dîrokî, derûniyê, erdnîgariyê, civaknasî û zanistên dinê hebin. Yanî bi kurt û kurmancî fîlmeke nû lazim e. Di wan fîlman de ku heya niha kolonyalîstan amade kiribûn, sergovend mêr û kolonyalîst bûn, her tişt di xizmeta wan de bûn, dikuştin, ser jê dikirin, diavêtin. Pêwîst e ev fîlma pênc hezar sal e berdewam dike biçe poxanê û fîlmekî ku qet ne mînanî fîlmê kolonyalîstan bê nivîsandin. Zemîna fîlmê li ser azadiyê an jî êdî peyvên nû lazim in. Yanî çîrok û gotinên nû.

Pêwîst e em di van her du mijaran de jî bi xwe re şer bikin. Em rûnin ji xwe re çîrokan bibêjin, qala dîrokê bikin, jiyanê binirxînin. Lê di vir de mijar ne hînbûna dîrok û nirxandinê ye, devjêbernedana zimanê zikmakî ye. Rakirina otoasîmîlasyonê ye.

Û dîsa ez hebûn û jiyana jinê pir pîroz dibînim ger heya bi aliyê fîzîkî ve zerarê nede giyanewaran, azadiya zindiyekî asteng neke (helbet xweparastin ne tê de, ew mafê her giyanewarê ye) çi dike bi kêfa xwe ye. Êdî wextê jiyîna bi dilê wê hatiye, otomêrbûniyê em dê vegerînin xwebûnê. Em ê otoxirabbûnê jî şîfa bikin, xwe nas bikin, zimanê xwe nas bikin û romana xwe ji nû ve binivîsin.

# Gel, gelperwerî û bawerî

Feyzî Mîrhesen

Tê gotin ku mirov weke hemû candaran hatiye afirandin. Mirov zane, bi hişmendî ye û difikire . Mirov beriya baweriyê tê. Dû re bawerî dikeve jiyana mirovan. Kes, civak, gel û dû re jî netew ava bûn. Her wiha di hemû dîn û olan de jî cure cure bawerî hene. Çawa ku bawerî hene wisan jî gel henin.

Lê gelo gel perwerî çiye? Kesek an jî civakek ku ji nijadekê be wê gavê divê ku gel û netewa xwe esas bigire. Em li jiyan û hin tekoşînên pêxemberan dinêrin ku têkoşîna wan ji bona baweriyan bûn. Gelperwerî an jî netew esas nebûn . Mînak Hz Nûh, malbata wî pêra nebûn. Lê belê Nûh jî li wan xwedî derneket. Jiyana hemû pêxemberan heya tê îslamiyetê hemû wiha bûne. Piştî Hz Mihemed kuştina Hz Elî û malbata wî, êdî jiyan tê guhertin. Nijad û gelperwerî dikeve pêşiya baweriyê. Dibin ereb, ecem û tirk. Her çiqas bi navê bawerî û oldariyê xwe dabin nîşandan jî di esasê xwe de bûne neteweyên gelê xwe. Ji emewiyan heyanî osmaniyan ev kevneşopî tê. Bi navê baweriyê bûne qiral, padîşah û cure cure hizb. Baş e heya vira çê û xirab her gel û milet neteweyên xwe ava kirin. Civaka kurd çima ev rêbaz nexebitandine? Em li bawermendên gelên din binêrin, mînak ; mirov ji kîjan ereb û tirkan bipirse, bawermend an jî nebawermend be, dibêjin em tirk in, ereb an jî faris in. Hizba Hemasê dibêje em sîstemeke "îslamî" dixwazin lê! em filistînî ne an jî ereb in. Îranî bi eslê xwe faris in lê mezheb û baweriya xwe ji bona neteweya xwe bi kar tînin. Dibêjin "Em Şîa ne", belê, rêxistin û amûra wan bi baweriyê ve girêdayî ye lê nabêjin em ne faris in. Gelê îsraîlî avabûna dewleta xwe bi baweriya xwe ava kiriye, dibêjin : "Em cihû ne" lê nabêjin : "Em ne lawê îsrailiyan in, an jî zarokên Îshaqê lawê Hz. Îbrahîm in." Baş e em li hin rêxistinên me 'kurdan' binêrin. Mewlana Xalidê Şarezorî yê ku dahênerê terîqeta (rê) Neqşebendîyê ye, bi eslê xwe kurd e, bi sedan rêxistinên wan di nava sîsteman de hene. Em ji wan bipirsin : "Baş e hûn Neqşebendî ne, mala we ava. Lê hûn weke miletê faris, an jî tirk ji gelperweriya xwe re çi dibêjin?" Lê dema ku şaşik û cube lê bin û di karekî fermî de bin, ewilî dibêjin: "Ez bawermend im û em misilman birayên hev in". Dîn û bawerî ne, ev tercîh e û di ayetê de tê gotin ku di dîn de zordarî nîne. Lewra netewebûn ziman e, kurd e, ereb e û dûre bawermend an jî ne bawermand in. Xweda ferman dike ku me ziman û dirûvên we cuda cuda afirandine. Negotiye hûn mecbûr in ku bibin dîndar. Mebesta min ne rexnekirina terîqên ku bi gel û baweriyên xwe va girêdayî ne. Bi wan, Mela Seîdê Kurdî an jî Mewlana Xalidê Şarezorî (Bexdadî) dijberiya doza gelê xwe dikin. Elbet mirov dê baweriya xwe biparêze. Lê Xweda dibêje: "Me hûn weke milet afirandiye. Ziman û reng daye we. Kesên van reng û zimanan înkar bike, ew ayetên Xweda jî înkar dikin." Her çiqas em van gazinan bikin jî ji Xweda re pesindar im ku bawermendên me yên kurd dînê wan çi dibe bila bibe, di bin dîn, netewe û kurdayetiyê de bimeşin. Misilmanî, zerdeştî û baweriyên gelê me çi dibe bila bibe, li hemberî azadî û gelperweriyê nabe asteng.

# Faşîzm roşan de zî gonî rijna

Valêre

Bawerîya îslamî de domanê Îbrahîmî û cinîya ci Sare nêbîyayêne. Îbrahîm wad keno eke Sare ra domanêk ci bibo do domanê xo qurbanê Homayî bikero. Domanêk înan ê bi beno û seba ke ci qurbanê Homayî bikero domanê xo gêno û şono koyêko herêma Morîya. Wexto ke kardî derg keno ke doman bibirno melekêk vendeno Îbrahîmî vano dest pa mede domanî û berano ke kewto mîyanê leman qurban bike. No hedîse ra dima roşan beno Roşanê Qurbanî û domanê Îbrahîmî merg ra xelîsîyeno.

Goreyê bawerîya îslamî Roşanê Qurbanî yena manaya nizdîbîyayîşê Homayî û seba nîyetê Homayî qurbandayîşî. Sewbîna ziwan û kulturan de zî nameyê cîya cîyayî ê roşanî estî. Cayo ke bawerîya îslamî tede biba de roşan zî esto. No roşan de seba ke tewr zêde bize yena birnayene xeylê cayan de sey roşanê bize zî yeno zanayene.

Orf û adetan de roja roşanî serê sibayî lez yeno weriştene, şam yeno hadrekerdene, nimajê roşanî yeno kerdene, zîyaretê goristanan virazîyeno û dima ra şîyayîşê meymanîya merdim û cîranan dest pêkena. Seba zerrîweşîya domanan pere dîyeno û şeker yeno vilakerdene. No roşan de zî tay keyeyan de domanê ke wextêk doman bî û şîyêne arêdayîşê şekeran çinî bî. Dayîk û pî bêrîya domananê xo kerdî. Rewşa xirab oyo ke xeylê merdim estî ke kerrayê mezelê doman ya zî merdimanê înan daxî çînî bî. Na roje de reyna ê tena mendî û ê ke mezelê domananê înan estbî serê mezelî de roşanê domananê xo bimbarek kerdî û ê ke kerrayê mezelê domananê înan daxî çinî bî keyeyê xo de tena mendî û dejê înan na roje de reyna newe bî.

Bawerîya îslamî de manaya Roşanê Qurbanî oyo ke merdimî yewbînan bipersî, şêrî bêrî zîyaretê yewbînan û goristanan de merdeyanê xo zîyaret bikerê. Na roja bimbarek de aştî virazîyena û maben dîyena şerê qilêrinan ê dinya û keyeyê ke mabenê înan de husumet biba na roje de dest pa nêdanê yewbînan. Yanî awêk rijîyena şerî ro û aştî virazîyena. La no roşan de zî wina nêbî. Mana û kerdiş seyyewbînan nîyî. Çîyo ke yeno vatene helal nîyo yeno kerdene.

21ê temmuze de qezaya Meramî ya Konya de grûba nîjadperasta ke 60 kesan ra pê amêyene hêrişê keyeyêkê amedijî ke 20 serrî yo ewja de cuwîyeno kerd û Hakîm Dalî qetil kerd. Nîjadperestî kam bawerî ra benê wa bibî, zerrîya înan timî hêrişkar a û her çiqas ke ê xo rê vajî ma merdimê bawermend î zî înan de bawerî qet çin a. Homa vajo se ê ekse ci kenê la xo reyna zî sey merdime tewr nizdî ê Homayî vînenê. Nîjadperestê hov na roje de zî gonî rijna û bi hawayêko hovane qetlîyam pê ardî.

Zîhnîyeto hovane ê faşîst her cayê dinya de qetlîyamanê hovaneyan pê ano. Ma nê numineyan çeteyanê DAIŞî de dî. Ê çeteyê ke nameyê Homayî vanê û qetlîyamanê hovaneyan pê anê û seba ke tersê xo bikerê zerrîya merdiman dîmenanê hovaneyan weşanayêne, wayîrê eynî zîhnîyetê faşîstî yê. Ê faşîstî wazenê cayo ke tedeyî de tersê xo bikerê zerrîya merdiman. Nameyê nê çeteyan çiqas bibedilîyo zî ê tarîx ra nata qet nêbedelîyayî û merdimê mazlumî nê hovan ra qet nêtersayî û têkoşînê xo ra gamêk apey nêeştî. Çeteyê hov hercayê dinya de seyyewbînan î. Nîjerya de her roje mekteban ra bi seyan domanan remnenê, Sûrîye de doman û cinîyê ke remnenê roşenê, qetil kenê û domananê 8 serreyan reyde zewecîyenê. Tirkîya zî gam bi gam nizdîyê nê hovan bena. Çimkî nê çeteyê hov seba girewtişê destkewteyanê cinîyan û letekerdişê şarê kurdî Tirkîya de yenê perwerdekerdene. Vera kurdan de polîtîkayêk nîjadperestî ke kîn û nefrek kena zerrîya merdiman yena rayraberdene. Bajarê tirkan de kurdî yenê hedefgirewtene. Faşîzm nîjadperestîye ra mird beno. Kurdî her roja Homayî yenê qetilkerdene. Roşan de zî kurdan rê zerrîweşî zêde yeno dîyayene.

Rewşa kurdan û şarê mazlum ê bînan sey ê Îbrahîmî nîya. Senî ke domanê Îbrahîmî mergî ra xelisîya domanê bînî zî werikna bixelesîyayêne û ti dayîk û pî dejê domananê xo nêvînayêne. Dinya dinyayêka bêedalet a. Tay kesan rê cinnet a, la tay kesan rê zî zilm a.





# ‘Ma baş zanenê ke şîdet polîtîk o’

Afyon de vera 7 karkeranê kurdan, Anqara de vera keyeyêkê kurdî hêriş ame kerdene. Tewr peyên zî 21ê temmuze de qezaya Meramî ya Konya de grûba nîjadperasta ke 60 kesan ra pê amêyene hêrişê keyeyêko amedijî ke 20 serrî yo ewja de cuwîyeno kerd û Hakîm Dalî (43) qetil kerd.

Hemsereka Komeleya Heqê Merdiman (ÎHD) Eren Keskîne pare kerd ke nê hêrişî polîtîk ê. Keskîne daye zanayene ke Komîsyonê ÎHDyî yê vera Nîjadperestî û Cîyakerîye pêro hêrişanê nîjadperestan bi baldarî teqîb keno. Keskîne dîyar kerde ke wextê peyênî de hêrişê vera kurdan zêdîyayîn û vat: "Ma baş zanenê ke şîdet polîtîk o. Ziwanê şîdetî, cîyakerî û nîjadperestî yê dewlete nê hêrişan zêdînenê. Na cografya de kesê ke nê hêrişan kenê bêceza yenê verdayene.

Mehkeme û dozgerî hêrişanê nîjaperestan goreyê madeya 22. ya TCKyî nêercnenê, pê çimê edlîyî nêewnenê nê serebûtan û no nêzdîbîyayîş hêrişan zêdîneno. Kişîyayîşê Denîz Poyraze zî netîceya nê ziwanê îqtîdarî bîye. Ma nê hêrişan de dosyayan teqîb kenê û xo resnenê keyeyan la keyeyî tersenê. Hêrişanê Konya, Anqara û Afyonî de pêro merdiman vat ke semedo ke ê kurd ê vera înan hêriş ame kerdene. La mîsal Afyon de dozgerî hetê nîjadperestîye yê serebûyî peygoş kerd."

Keskîne peynîya qiseykerdişê xo de ard ziwan ke ganî hêrişanê winasênenan de serebût çarçewa nîjadperestîye de bêro ercnayene. ***STENBOL***

# Oluç: Dişmenîya şima ya vera kurdan axû vila kena

Rêxistina Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) Stenbolî Meydanê Şîşhanê yê Beyogludî de hêrişê vera kurdan ê ke demo peyên de zêdîyayî de şermezar kerdî. Pîya parlementerê HDPyî temsîlkaranê rêxistinanê komelê sîvîlî zî paştî daye eşkerayîye.

Hemserekê HDPyî yê Stenbolî Erdal Avciyî ard ziwan ke rîyê polîtîkaya îqtîdarî ra nê hêrişê nîjadperestî bi hewayêkê organîzekerdeyî yenê kerdene û vat: "Eşkerayîya Walîtîya Konya hêrişê nîjadperestî sey meşru rajneno la mesele têna meseleya Konya nêya."

Parlementera HDPyî ya Amedî Dersîm Dage zî ard ziwan ke bi polîtîkayanê leyminan hêrişê vera kurdan yenê rayraberdene û vat: "Kurdî hinî dost û dişmenê xo hole nas kenê. Êyê ke înan qetil kenê nas kenê. Eke qetilkera hukmat nêyo wa hesabê nê hêrişan biperso."

Serekwekîlê Koma HDPyî Saruhan Oluçî vat: " Dewlete vera hêrişanê Ewropa vengê xo vejena la tîya şima qey bêveng ê? Almanya de nazî faşîst la êyê ke hêrişê kurdan kenê, şima nîjadperest nêyê? Wezîrê Teberî ti vanê qey ti nîjadperest nêyê? Heme dinya şima vînena. Şima qet biney nêşarmîyenê? Pê nê hêrişan sûco pîl yeno kerdene. Peynîya nîjadperestîye zîhnîyetêko qirkerdox o. Nê hêrişan de sûcê nefretî, sûcê merdimîye, sûcê kiştişê merdîman, birîndarkerdiş, teşebusê mergî, zirardayîşê malî, çokdayîşî estê. Gama ke nê sûcî benê hukm se keno? Dozgerê ke tim partîya ma rê fezlekê şawenê şima hay ça? Hêrişkaranê kurdan rê şima dîyarîya bêcezayîye danê. Coka hêrişî dewam kenê."




Oluçî diyar kerd ke rîyê polîtîkaya hukmatî ra hêrişê vera kurdan zêdîyênê û vat: "Ziwanê şima yo ke haştîye komelkî xeripneno, dişmenîya şima ya vera kurdan axû vila kena. Îqtîdar komelî cêser fîneno. Berzeyê dişmenîye nano ro. Ganî îqtîdar hîşê xo bîyaro pêser. Hesabo sîyasî yê poltîkayanê ci do giran bo. Hêrişê ke ewro vera HDP û kurdan benê eke vera nînan tewiro qerardar nêro girewtene rewşe do xirabêr bibo." ***STENBOL***

# E-kovara Herd ya hûmara diyîne weşanîya




Merkezê Xeberan

E-kovara hîrê aşmeyî ya edebîyatê kurdkî ke bi kirmanckî û kurmancî vecêna bi hûmara xo ya 2. vejîya. Hûmara yewîne a Herd aşma adare de amebî vilakerdişî, nika hûmara diyîne bî vila. Herd hîrê aşmî de reyêke bena vila û yê biwazê eşkenê serê malpere ra bar bikerî û biwanê.

Hûmara hamnanî de hîkaye, şiîr, nuşteyê açernayeyî estê. Na hûmare de şiîrê Omer Barasi, Dilo Bargiran, Newzad Valêrî û Bedirxanî ameyî cakerdene. Îdris Yazar û Zerrweş Xodî zî bi hîkayeyanê xo kovare de ca girewtê.

Alî Aydin Çîçekî hîkayeyêka Yilmaz Guneyî tirkî ra açarnayo kirmanckî (zazakî). Kovara Herd de edîtorê kirmanckî Ugur Sermîyan, edîtorê kurmancî Mahsûn Reşçelan o. Lijney weşane de Gewher Fetah, Alî Aydin Çîçek, Gulgeş Deryaspî, Bedrîye Topaç, Omer Barasi, Rojda Yaşîk, Omer Dilsoz, Ugur Sermîyan û Mahsûn Reşçelan ca gênê.




# Çend pêkenokên kurt

**Doktor ez zengîn kirim**

Carekî mirovekî gelekî pesnê doktorekî bajarê xwe da.

Hevalê wî jê re got xêr e tu ewqasî pesnê vî doktorî didî?

• Mêrik got: Ji ber ku wî ez zengîn kirim.

• Çawa te zengîn kir?

• Wî apê min ê zengîn ê ku ez bûm wêrisê wî emeliyat kir û tevî hemû hewldanan apê min jiyana xwe ji dest da.

***

**Ez tirî dixwazim**

Beriya ku mêrik îdam bikin jê pirsîn ka çi daxwazên wî yên dawî hene

***Mêrik got***: Ez tirî dixwazim

***Jê re got:*** Ma di vê demsalê de em ê tirî ji te re ji ku bînin


***Wî got:*** Wele kêfa we ye, eceleya min tune ye, dixwazin bimînin heta demsala tirî tê, wê gavê tirî pir dibin.

***

**Çakêtê boksor**

Amerîkiyek derbasî xwaringehekê bû û çakêtê xwe li ser hilcoyê cilan daleqand. Kaxizek li ser nivîsî û got: "Ev çakêt yê boksorekî bi nav û deng e." Piştî ku mêrik ji destavê vegeriya dît ku çakêtê wî ne li wir e û li şûna kaxiza wî yeke din heye, li ser wiha nivisandiye. Çakêtê te ji aliyî şampiyonê bazdanê ve hat dizîn û niha bêyî ku li paş xwe mêze bike baz dide.

# Tiştanok (mamik)



**1-**Tiştek min heye
Zeviyeke çiqasî tu kur dikî
Dîsa şîn dibe
Gelo ew çi ye?


**2-**Tiştek min heye
Mamê mino
Dava (dafka) dêzî
Bi kendêl ve bezî
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine . Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**
**1-Pirç, por 2-Kew**

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3. Ji niha şûn de 5. Cînavkeke pirhejmar
7. Darvekirin 8. Cînavkeke nîşandanê ya nêzîk
9. Kesên ji Azerbeycanê 13. Ar 14. Heskirî, destgirtî 16. Arvan, genimê hêrayî
19. Wêjeyî 20. Noteke mûzîkê 21. Kurt 22. Xwarinê xweş dike lê hinek kes ji bîna wê aciz dibin 25. Hewa. 26. Çêjeke xweş
28. Bajareke başûrê Kurdistanê

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Îlahî
2. Meheke biharê
3. Xwarina sewalan
4. Roja em tê de
6. Daneke rojê
10. Ax, zevî
11. Kesên ji Îranê
12. Cejn
15. Paytexta Îtalyayê
17. Zimanê cihûyan
18. Qewm, milet, irq
20. Ava zêde ya ku di newalan de diherike
23. Roj
24. Alava ku nanê tenik li ser dipêjin
27. Bersiva neyênî

Bersiva hefteya borî



Şûjin

Dildarê Amedê

# Weyla belqitiyo Heseno

Dema havînê, kelekela germa havînê ye, her kes xwe li avê digire û her yek li gorî îmkanên xwe dixwaze xwe hênik bike. Derfetên hinekan derya ye, yên hinekan çem û kanî ne û yên hinekan jî teşta avê ye. Ji ber ku derya li welatê me tune ne em jî xwe li gol, çem û bendavan digirin. Gelek caran ji bo vê hênikkirinê mirov jiyana xwe jî ji dest didin.

Li Serxetê dîsa gelek deverên şînkayî çem û kanî û seyrangeh hene lê li ba me li Binxetê û bi taybetî li herêma Cizîrê ji bo rojeke xweş em li ber avê derbas bikin em ji Qamişlo diçûn heta Indîwerê ku di navbera wan de ne şaş bim nêzî 150 Km heye.

Jixwe nîvê rojê bi çûn û hatinê derbas dibû lê dîsa çend saet be jî xelkê xwe hênik dikir. Ber êvarê dema vegera malê bû, îca nêzî 3 seatan rêya vegera malê li pêşiya wan bû. Heta dihatin malê dîsa di nava toz û xwêdanê de diman.

Beriya demekê Mecîdo li ser malpera xwe ya civakî behsa çîroka xwe ya zaroktî ya avjeniyê kir. Min jî xwest ku çîroka wî bi kurmancî bi we re parve bikim.

Dem havîn bû. Mamoste zarokên dibistanê biribûn geşt û seyranê. Ji bo xelkên wê herêma Cizîrê ya Binxetê tevan, dema ku dilê wan ê geştê hebû berê xwe didan Indîwerê. Carekê bilind hebû di binya car re çemê Dîcle û li hemberî car jî bajarê Cizîra Botan yê Serxetê xuya dikir.

Welhasilî, ciwanên nûhatî ku zarokên dibistanê yên 10-15 salî bûn yek bi yek xwe diavêtin nava çemê Dîcleyê. Mecîdo jî xwest ku li pêşberî hevalên xwe hinekî xwe qure û paye bike, nexasim ku di nava wan de hevalên keç jî hebûn.

Mecîdo li kêleka çem çû ser carekî bilind û ji wê bilindahiyê xwe avête nava çemê Dîcleyê. Devê her kesî vekirî ma û tevan bi matmayî li Mecîdo nêrî.

Lê dema Mecîdo xwe avêt di rê de hate bîra wî ku ew avjeniyê anku soberiyê nizane.

Tenê berê li çemê Cerahê xwe diavêt avê ew jî ava wî gelekî nizim bû û bi ser wî nediket. Heta ku ev hat bîra wî hasil gihabû Mûsil û Mecîdo di nava çemê Dîcleyê de bû. Di nava çem de keftelefta wî bû dest û lingên xwe davêtin vî alî, wî alî lê car caran noqî nava avê dibû.

Mecîdo piştî ku çîroka xwe gihand vê derê êdî got hevalno de îca bila hevalê min ê ku ez rizgar kirim vê çîrokê bibe serî. Mecîdo berê xwe da Heseno û got de îca tu ji hevalan re berdewamiya çîrokê bêje û çawa tu hatî te ez rizgar kirim.

Li vir Heseno xwe li ehmeqşeytaniyê danî û got tiştek wiha nayê bîra min. Eman zeman Mecîdo kir û nekir Heseno înkar kir û got qet tiştekî wiha nayê bîra min.

Pepûkê Mecîdo bû dizê sola xwe û gelekî şerm kir. Mecîdo di dilê xwe de got niha wê hevalên min bêjin ez derewan dikim û çîrokeke wiha çênebûye.

Kuro lawo Heseno xwedê rihê te bistîne ku nayê bîra te, te Mecîdê pepûk hetikand û ew bû pêkenoka cemaeta Facebookê.



# Di fîlm û çîrokan de têkçûyîn



Îlham Bakir



Mirov bala xwe bide fîlmên demên dawîn ên ku ji aliyê derhênerên kurd ve tên çêkirin, ev rastî pir aşkera tê dîtin. Karakterên çîrokên van fîlman hemû kesên têkçûyî ne. Bi ser nakevin, xwedîtîraz bin jî di dawiya çîrokê de têk diçin. Dimirin, direvin, koç dikin, tên kuştin. Berxwedan bê feyde ye. Karakterên kurd di van çîrokan de nezan in, bê hêz in, neçar in, mexdûr in. Tenê ne berxwedêr in. Ev nêrîn, nêrîna metingeran e ku senaryonûsên kurd ji xwe re kirine bingeh. Çîrokên xwe bi çavên, bi şîroveyên, bi hişmendiyên mêtingeran dinivîsînin.

Sînemagerên kurd bi piranî li welatê xwe najîn, lingekî wan li ser axa xwe, li ser axa Kurdistanê nîn e. Hemû angaştên wan, hemû peyvên mezin ên ku dibêjin, hemû çîrokên wan ên ku dinivîsin pala xwe didin jiyana 'xweşik' û 'ewle' ya metropol û paytextên mêtingeran. Stenbol û Ewropa ji bo van hunermendên rehetperest û berjewendîperest plantasyoneke ku bi hişmendiya mêtingeriyê xwe jehrî dikin e. Bi taybetî jî Swêd û Stenbol ji bo afirandina hunermendên ku di xizmeta mêtingeran de ne roleke girîn girtine ser xwe.

Ev hunermend û rewşenbîr her tim dixwazin. Ji desthilatdaran dixwazin, ji her cure navendên hêzan dixwazin. Azadiyê dixwazin, pere dixwazin, xelatan dixwazin, erêkirinê dixwazin, aqil dixwazin, dixwazin ku rê li wan bên vekirin. Êdî çi bidin mala wan ava. Di berdêla van tiştan de ji hunera xwe, fikrên xwe yên rewşenbîrî heta dawiyê dixin xizmeta mêtingeran. Bi rêya huner û ramanên xwe polîtîkaya mêtingeran kûr dikin, vedişêrin da ku bi rehetî li ser gelan bê meşandin.

Îro, kurdan berxwedan û têkoşîna herî mezin a di nav sedsala ku li paş maye de û di sedsala ku em tê de ne de derxistiye holê, wek gelekî mêtingeh ji bo ku ji kesayetiya mêtingehê rizgar bibe têkoşîneke pir dijwar dimeşîne. Kurdan wek gelekî ku vejîna xwe pêk aniye divê têkoşîneke ji têkoşîna heta îro li hemberî mêtingeran meşandiye, qat bi qat zêdetir bide. Rizgarbûna ji kesayetiya mêtingehê, ji rizgarbûna ji mêtingeriyê hezar caran dijwartir e. Ev kesayetî wek nexweşîna pençeşêrê di giyanê kesên mêtingehê de tevdigere û ev kes nikare rizgar bibe. Mêtinger bi awayekî fîzîkî ji mêtingehê diterikînin lê polîtîkayên wan mêtingeran û mêtingehê naterikînin. Bi rêya çandê mêtingehkirin berdewam dike û dewsa hişmendî û pratîkên çandî yên xwecihî çanda mêtinger dibe xwedîbandor. Çanda mêtingeriyê çanda xwecih vediguherîne, di qada çandî de durehiyekê pêk tîne. Biyanbûneke ji mêtingerperestiyê pêk tê. Kesên xwecih dibin biyaniyên axa xwe, hemû taybetiyên nasnameya wan ên resen serobino dibin, pûç dibin, vediguherin û ji xwe dûr dikevin. Kesayetiyeke kole derdikeve holê. Xwedî, nexwaze jî, ji ber ku kole hîn bûye, her tim xwediyê/a xwe dişopîne, nikare jê veqete. Ji şoreşê, ji guherîn û veguherînê ditirse. Naxwaze ku pergal biguhere, ji ber ku ditirse, nizane ku ew ê bêyî xwedî çi bike, bêyî mêtinger jiyana xwe çawa bidomîne. Nasnamaya xwe ya xwecihî û resen wenda dike û xwe bi nasnameya mêtinger pênase dike, bi pênasekirina mêtinger wateyê dide jiyana xwe. Her tiştê mêtinger teqlîd dike. Ziman, xwarin, vexwarin, cil û berg hemû wek ên mêtinger in. Encax bi vê teqlîdkirinê dikare xwe birûmet bihesibîne. Di şûna ku li hemberî mêtinger bertekê nîşan bide û li ber xwe bide, teqlîd dike û mêtingeriyê bi pêş dixe. Çanda mêtingeh çandeke pireh e, zir e. Di vê çanda hîbrîd/pireh de hişmendiya cotbûyî, dulibî derdikeve holê. Kesên mêtingehê him çanda xwe him jî çanda mêtingeran bi hev re di kesayetî û jiyana xwe de dihewînin. Ev dulibî, ev parçebûyîn destûrê nade ku mirov xwe ji tu aliyekî hîs bike. Xwe bêxwedî û bêwar dibîne. Ji ber vê yekê jî ji bo ku ji mêtingeriyê rizgar bibe, rizgarî û serxwebûna neteweyî têr nake. Serxwebûna neteweyî ya ku li başûrê Kurdistanê pêk hatiye pir aşkere nîşan dide ku serxwebûneke çawa ye, xizmeta kê û çi dike, kesayetiyeke çawa derxistiye holê. Li başûrê Kurdistanê heyraniya jiyana tirkan, xwesteka şibîna çanda tirkan, rumeta ku ji bo hinek hunermendên tirk tê dayîn a pûç û vala, ev hemû tevger û reftarî nîşaneya trawmaya keseyatiya mêtingehê ne. Ji ber vê yekê ji bo xwerizgarkirina ji çand û keseyatiya mêtingeriyê, pêdivî bi avakirina kes û keseyatiyeke nû heye. Bêguman peywira pêşengtiya vê kes û kesayetiyê dikeve ser milên wan senaryonûs, sînemager û hunermendên ku bi motîvasyone estetîk hilberîneriya hunerê dikin. Ev sînemagerên ku ji bo vê jiyan û keseyatiya nû pêşengiyê bikin divê bi hêşmendiyeke dijberî mêtingeriyê xwe xurt bike û bi çanda mêtinger re bi qasî serê derziyê jî li hev neyê. Bingeha afirandin û hilberîna xwe bi çand û nirxên cewherî yên gelê xwe, gelên derdor û cîranan tije bike û çîrokên xwe bi van nirxan bihone. Hunermendê/a azad û girêdayî nirxên gelê xwe, girêdayî nirxên gerdûnî, xwe ji otorîteyên hunerî yên mêtingeran, ji xelatdayîn û piştgirî û organîzasyonên desthilatdaran dûr digire. Têkiliya bi wan re yan jî wergirtina piştgiriyê ya ji wan ji bo xwe wek bêrûmetiyekê dibîne. Hilberînên xwe pêşkeşî erêkirin û pejirandina van zîgûratên hunerê nake. Ji bo hunermendê/a azad û dijberî mêtingeriyê qada erêkirin û pejirandinê, qada parvekirinê ew cih e ku gel tê de bi keda xwe diafirîne. Yanê sûk in, kolan in, gund in, zevî ne, bênder in. Eger qada parvekirinê xwe ji salonan, ji zîgûratên hunerê, ji metropolên mêtingeran xelas neke nikare li hemberî çanda mêtinger bi ser bikeve. Rêzikeke helbestê ya ku ji bo dilê dayikeke birîndar re bibe melhem, girteyeke fîlm di rûyê zarokekî wenda de bibe ken, ev ji sed xelatên zêrîn rûmetdartir e.

Di vê têkoşînê de motîvasyona hunermend a herî mezin, hêrs û kîna dilê wî/ê ya ku li hemberî mêtingeran diparêze ye. Bêyî parastin û zêdekirina vê hêrs û kînê ev têkoşîna mezin nayê meşandin. Li cihê ku hêrs û kîn kêm dibe li metingeriyê re lihevhatin dest pê dike. Stephane Hessel di pirtûka xwe ya bi navê 'hêrs bibin' de dibêje 'merhaleya yekemîn a berxwedanê, li hemberî bêrûmetkirinê, li hemberî zordestiyê hêrsbûn e, hêrs û bertek çalakî ne." Hêrs û bertek çiqas mezin bin, çalakî jî ew qas mezin dibe. Senaryonûseke/î kurdistanî divê tu demê li hemberî mêtingeriyê hêrs û bertekê ji çîrokên xwe kêm neke.

# Li Moskovayê fîlmê 'Keçên Rojê'

Fîlmê bi navê 'Keçên Rojê' (Girls of the Sun) yê ku li ser berxwedana jinên kurd a li dijî DAIŞ'ê tev li festîvala yekemîn a fîlmên Kurdî ya li Moskovayê bû. Festîval di 21'ê tîrmehê de, bi fîlmê 'Keçên Rojê' dest pê kir.

Yekemîn Festîvala fîlmên Kurdî ya Moskoyê bi berpirsyariya Gûlîzer Gerdenzerî birêve diçe.

Fîlmê Keçên Rojê ji aliyê derhênera fransî Eva Husson ve hatiye çêkirin. Di fîlmê de lîstikvana îranî Gulşîfte Ferexanî (Golshifteh Farahan) û lîstikvana fransî Emmanuelle Bercotê cih girtine.

Di Festîvala fîlmên Kurdî ya ku li Moskovayê dest pê kirî de derhênera fîlmê axivî û diyar kir ku cengawerî wêrekiya jinên kurd a li dijî hovîtiya DAIŞ'ê gelek bandor lê kiriye û ji ber vê yekê jî ev film çêkiriye. Her wiha Husson da zanîn ku dema film kişandiya wek çavkaniyên sereke êrîşên dij mirovane yên li ser êzidiyan, revandina jinan û tekoşîna jinan a li dijî van êrîşan ji xwe re esas girtiye.

Hewceyî gotinêye ku fîlmê 'Keçên Rojê' tev li Festîvala Navneteweyî ya 'CANNES'ê ya Fransayê jî bubû.
***MOSKOV***





# Bi şanoya 'Çima'yê banga yekitiyê kirin

Tevgera Çand û Hunerê ya bajarê Dêrikê di çarçoveya meha çandê de bi diruşmeya 'Bi çand û hunera demokratîk em ê dagirkeriyê têk bibin û bi serkevin' şahiyek li Navenda Ciwanên Şoreşger a Şehîd Bawer li dar xist.

Tevgera Çand û Hunerê di çarçoveya rêzeçalakiyên xwe yên çandî de bi navê 'Çima' şanoyek li Navenda Dicle ya Çand û Hunerê ya Dêrikê pêşkêş kir. Bi dehan şêniyên Dêrikê û endamên Navenda Dicle ya Çand û Hunerê ji bo temaşekirina lîstika 'Çima'yê hatin gelhev.

Piştî deqeyeke rêzgirtinê Komîna Şano ya Koma Çiyayê Lêlûnê şanoyek pêşkêş kir û piştre banga yekitiya neteweyî kir.

Têkildarî mijarê derhêner û nivîskarê şanoyê Kawa Fetah axivî û wiha got: "Armanca ji vê şanoyê ew e ku şerê hundirîn ê kurdî ji holê rabe. Em bi vê şanoyê banga hezkirin û biratiya di navbera gelan dikin, nexasim bang ji bo yekitiya kurdan dikin."

Fetah da zanîn ku dijminên gelê kurd pir in û nameya me ya jî vê şanoyê wekî çîrokeke gundan e; dema ku nakokî di navbera birayan de çêdibe û mezin destwerdanê dikin da ku pirsgirêkê çareser bikin û nebe şer."

Çalakiyên Tevgera Çand û Hunerê li bajar û kantonên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dê heta du mehan berdewam bikin. ***DÊRIK***

xwebûn


26 Tîrmeh- 1 Tebax 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 84

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** Elif Can Alkan
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

# Tîrmeh û rûdanên tije xwîn û tevkujî



Kakşar Oremar

Tîrmeh çileyê herî tîr ê meha havîna her salê ye. Germahiya wê her çiqas germ û giran be jî jiyan têde bi liv û lebat e. Rûdanên di tîrmehê de qewimîne li Kurdistanê gelek in. Li vir ez ê amaje bi hinek ji wan rûdanan bikim ku di "hişê civakê" de tim zindî bûne.

**Girtîgeha Amedê û Erdogan!**

Rewşa îro ya girtiyên siyasî li Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê dîrokeke tije şoreş û fedakarî bi bîra me tîne. Dîrokeke ne zêde dûr lê tije destkeft ku li zindana Amedê hat nivîsîn, 'berxwedan'a wan ji nifşên piştre bû 'jiyan'. Qehremanên doza azadiyê yên ku dizanîn agirê canê wan yê ji hêlekê ve bibe agirê kursiya desthilatdarên faşîst û dîktator û ji hêlekê ve jî yê ronahiyê bide rûpelên dîroka azadîxwaziya gelekî bindest. Navê wan îro tirseke mezin bi ser laşê Erdogan de tîne dema ku tê Amedê û bêşermane dibêje: "Ji ber zulma ku li girtîgeha Amedê li we hatiye kirin, ez ê wê bikime navendeke çandî..." Kesek ku haydarî dîroka kurd û Kurdistanê nebe dikare bi gotinên wiha qeşmerane bê xapandin, lê kurd vê rastiyê baş dizanin. Bi qêrîn û hewarên qehremanên weke Mazlum Dogan, Mehmet Xeyrî Durmuş, Kemal Pîr, Alî Çîçek, Akif Yilmaz û hwd. cewherê zulma rastîn a Tirkiyeyê li Kurdistanê eşkere kirin û rûreşiyê kirin para kemalîst û selefîstên Erdoganî. Ew girtîgeh bi daxwaza şoreşgerên kurd dê bê wêrankirin û bibe muze! Bila Erdogan wê qenciyê li zarokên vê dozê rewa neke. Ji hêlekê ve di axaftinên xwe yên şovenîstî de êrîşê PKK û HDP'ê dike û ji hêla din ve jî behsa muzekirina wê girtîgehê dike ku rêberên PKK'ê têde zanîngeha berxwedan û serhildanê ava kirine. Kesek ku şermê ji xwe neke û doza miletekî nas neke tenê dê weke Erdogan biaxive.

**Dr. Qasimlo û doza wî**

Gotinên wî yên tim balkêş û dewlemendiya bîr-ramanên wî yên demokratîk bi dost û dijminan didane selmandin: ***" Xebata me xebateke rewa ye. Xebat bona azadiya miletekî ye, xebat ji paşeroja zarok û nifşên din re ye. Ger em jî weke nifşê îro erkên xwe baş cî bi cî bikin hingî em dikarin hêvîdar bin ku nifşê paşerojê şehîd nebe. Her wiha ger nifşê beriya me an jî nifşên derbasbûyî bi rindî erkên xwe bi cih bianîna, dibe ku ev nifşê me yê îro şehîd nebûna."***

Carekê jî ji rojnamevanekî ewropî re wiha gotibû: ***"Ger me kurdan jî weke filistîniyan balafir birevandana, cihên sivîlan biteqanda û di nîveka dilê Ewropa de êrîşî dijminên xwe bikira, hingî civaka we ya qaşo demokratîk dê baştir dengê me bibihîsta, lê em çi bikin ku nikarin dest bi kiryarên terorîstî bikin..."***

Salên dirêj dengê bilind ê doza kurd di ragihandina cihanê da hevdîtinên bi Dr. Qasimlo(1930-1989) re bûn. Terorkirina wî di 13'ê tîrmeha sala 1989'an de cewherê demokrasiya hemû welatên ewropî baştir bi me da nasîn. Îro dema gefek an jî hewldanek ji bo revandina jineke rojnamevan a bi navê Mesîh Elînejad ji hêla dewleta Îranê ve tê kirin, hemû cihan pê dihese lê bêdengiya raya giştî ya cîhanê di dema kuştina mirovekî de ku bi hezaran xwendevanên weke Mesîh Elînejad perwerde kirin qet nayê lêpirsîn. Şahidiyê ji rastiyekê re dike ku nabe hemû kesên xwe mirov dihesibînin vê zulm û sivikatiyê bike û mafên miletekî 60 milyonî nebîne û nebihîse.

Dr. Qasimlo zû zanî ku komara îslamî ya Îranê wê sîstemeke demokratîk nebe. Ji ber wê jî ji gelê kurd û azadîxwazên Îranê dew kir ku refranduma sala 1979'an boykot bikin.

Gotinên wî yên di dema hevdîtina bi rayedarên komara îslamî re li bajarê Wien, piştî şehadeta wî rewşa îro ya hereketa kurd li rojhilatê Kurdistanê, nirxandinên wî yên hûrgilî û dûrbînane, di roja îro de cihê wî yê vala di qada siyaseta kurdên Kurdistana mezin de,berhemên wî yên akademîk- zanistî û lêkolînên berfireh dihêlin ku bêjin 'Qasimlo xwedî xwendingeheke serbixwe a şoreşgeriyê bû.'

Di wê bêdengiya watedar de me dîsa zanî mafên mirovan bûne qurbanê girêbestên aborî-siyasî.

Pêngavên Dr. Qasimlo bilind û dîrokî bûn, nêrînên wî dûr û kûr bûn, hêviyên wî mezin û bê dawî bûn. Bejina çinara xwezî û evîna wî bi qasî çiyayên Kurdistanê bilind bûn. Peyvên wî tije daxwazên demokratîk bûn. Çiqas zana û mirovhez bû ***Dr. QASIMLO***'yê dûrbîn.

Peyv û helbest nikarin wesfa vî şervanê doza azadiya mirovahiyê bidin.

Ew guleyên ku dil û mejiyê Dr. Qasimlo kirin armanc, bi wê meremê bûn ku bîr û ramanên wî bikujin û nehêlin tovên ku wî di qada xebata xwe ya li Kurdistanê de reşandibû şîn bibe, lê terorîstên komara îslamî ya Îranê nedizanîn ku Qasimlo beriya mirinê tovê bîr û ramanên xwe li her dera Kurdistanê çandibûn ku peyamên demokrasî, sekûlarîzm, azadî û wekheviyê bûn. Niha di qada xebata siyasî de hezaran Qasimlo sax in, ji nava kuçe û kolanên bajar û gundên Kurdistanê heya nava dilê zanîngeh, girtîgeh, navendên wêjeyî, çandî û di her dereke qadên şoreş û xebatê de bi milyonan kes li pey rêbaza wî ya demokratîk in. Rewşa ku îro cinayetkarên dîrokê têde asê mane nasnameya hikûmeteke faşîst û paşverû bi me dide xuyakirin ku tev li Îranê diyar in. Cîhan baştir dizane ka ferqên di navbera ramanên Qasimlo û Xumeynî de çi ne û kîjan mehkûmê têkçûnê ye. Hinek sîstemên ku bi raman paşverûtiyê dikevin nava zibildanka dîrokê lê kesên pêşverû jî bi ramanên xwe yên ku derbasbûna dem û dewranan kevin nabin, weke gulekê yê bişkiftî bimînin.

Bi rûdanên wiha tirajîk re nabe em xemsar bibin, çimkî îroya qedera Dr. Qasimlo û yên din siberoja me jî didin diyarkirin.

Bîr û ramanên wî, teorîzekirina pirsa kurd di nivîs û axaftinên Dr Qasimlo de dihêle ku em bibêjin mekteba Dr. Qasimlo xwedî şagirdên hêja bûye.

**Tevkujiya Geliyê Zîlan**

91 sal ji ser fermana gelê kurd ya li Geliyê Zîlan re derbas bûn, bes hêşta jî tevkujiyên weke wê li Kurdistanê berdewam in. Di asta rûdanên wiha tije êş de gelo erkên me çi ne?

Bi nave wê tevkujiyê re Xoybûn, Mîr Celadet Bedirxan, Îhsan Nurî Paşa, Heskê Têlî û gelek navên din jî tên bîra me.

Agirî berdewamiya serhildana Şêx Seîdê Pîran, serhildana Geliyê Zîlan jî berdewamiya Agiriyê ye. Ji 20'ê hezîrana sala 1930'î heya 13'ê tîrmeha sala 1930'an ew serhildan berdewam bûye lê ji wê rojê û şûnde bi qasî du hefteyan artêşa Tirkiyeyê bi emirê rayedarên tirk li Enqereyê û bi serkêşiya kesekî bi navê Salih Omurtak fermanê li erdnigariyeke berfireh ku 44 gund têde hebûne didin destpêkirin. Li gorî gelek jêderan 15 hezar kes têne kuştin.

Ew sal salên diyarkirina qedera miletekî bûn ku serî li hemberî biryarên gelek peymanên dijmafê xwe hildabûn.

Piştî têkçûna serhildana Agiriyê, tevkujiya Geliyê Zîlan û şehîdkirina Simkoyê Şikakî êdî zemîn ji bo xweşkirina danûstandinên diplomatîk di navbera Riza Pehlewî û Mistefa Kemal de tên çêkirin. Amadedekariya peymana Seîdabad a sala 1937'an li pey guherandina sînorên bakur û rojhilatê Kurdistanê bi merema têkbirina serhildana Agirî û Simkoyê Şikakî tên kirin. Xala herî balkêş a wê peymanê ew e ku Riza Pehlewî û Mistefa Kemal li dijî dijminên du aliyên sinor destê hevkariyê didin hev. Dijminên wan yên li her du aliyên sinor kurd bûn.

Zihniyeta înkar û tunekirina kurdan ji 1930'yî û beriya wê di gel zihniyeta yên ku îro li ser kar in zere-misaqelekê jî nehatiye guherîn.

Kesên ku piştî fermana Agirî, Makû, Geliyê Zîlan û Urmiyeyê sax filitîn sirgunî Edene, Qezmîn û bajarên din yên Îran û Tirkiyeyê kirin. Li wir heta birînên ku di mil, ling anku laşê wan de birîn hebûn jî hatin darizandin û salên dirêj di zindanên wan de weke dîlan jiyan derbas kirin. Guleyên di laşê wan de hingî derketin ku ew jî pê re mirin.

Şahidên wan rojên tije agir û xwîn hem rûpelên rojnameya Cumhuriyetê ku wek organa fermî ya komara kemalîstên Tirkiyeyê bûn hem jî ew kesên kurd bûn ku bi saxî filitîn. Yek ji wan Xalê Tahir Nas yê 103 salî ye ku hingî 10-11 salî bû. Ew li ser wan rojên giran wiha dibêje: "Min ji ber agirê tivingên leşkerên tirk xwe di bin meytan de veşartibû. Bi du metra dûrî min pîrekek bi hewar û qêrînan li ber halê xwe dida, yekî leşker çû ber wê ku gustîlka tilîya wê derxîne, min bi çavê xwe dît, wê pîrekê di hilma xwe ya dawî de pehîna xwe li sîngê leşker xist û rih da. Leşker tilîya wê şikênand û gustîla wê derxist. Di dewa diya min a mirî de birayê min ê du mehî hebû. Leşkeran wî ji dewa diya min derxistin, rahiştinê, singû pê vekirin, wî ber ba kirin û kuştin" ***(1)***

Şahidekî din jî wiha dibêje:

***"Xelk li mizgefta Kara Yusif a gund kom dikirin û her rojê 200 kes li ber çavê me dibirin û dikuştin. Newalên nava dilê Geliyê Zîlan tije meytê jin û zarokan bû. Gola xwînê hê jî li ber çavên min e..." (2)***

Li rûpelên rojnameya Cumhuriyetê yên bi dîroka 13'ê Tîrmeha 1930'yî binêre ka çawa bi şanazî behsa tevkujî û dijminahiya dewleta xwe li dijî gelê kurd dikin: "Asiler 5 Günde imha Edildi..." ***(3)***

Fermana kesên ku piraniya wan zarok, pîr, jin û kal bûn bi hinceta hevkariya bi serhildana Agiriyê re bi qasî du hefteyan berdewam bû.

Wêne û dîmenên ku hene têrê dikin ku berpirsên îro yên dewleta Tirkiyeyê dawa lêborînê ji gelê kurd bikin. Bila raporên serleşkerên artêşa xwe yên wan salan vekin û rastiyên ku nasnameya, tevkujiyeke sîstematîk aşkera dikin, bibînin.

Navnîşanên din yên wê tevkujiyê dikarin mîna xalên li jêr jî bin:

- •Rojnameyên wan bi nûçeyên xwe yên tije şiroveyên kurt û bîranînên serleşker û serbazên wan di arşîvan de.
- •Şahidên hê sax ku behsa bi singûyan kuştina zarokên hê di zikê dayikan de dikin û ev jî, yanî merema dewletê a herî diyar û eşkere ji holê rakirina miletekî li ser axa wan ya dêrîn e.
- •Guherandina demografiyê û bicihwarkirina miletekî din ku qirgîz ji Efxanistanê anîne û li cihwarên kurdan bi cih kirine.
- •Li pey qetlîamê sirgûn û piştre jî mehkemekirina kesên mayî di dadgehên leşkerî de.
- •Helwesta dewleta Îranê ya erênî li hemberî wan kiryarên hovane û rejîma qaşo sosyalîst a Sovyeta berê ku tenê temaşavanên kuştin û tunekirina kurdan bûn.
- • Xweşkirina zemîna fermana Dêrsimê û bicihkirina bendên peymana Seîdabad.
- •Belgename dikarin di warê hiqûqî de hevkariyê bidin aliyê kurd ku pena xwe bidin ber dadgeha Lahê, rêxistinên mafên mirovan li Ewropa û Amerîka.
- •Wan salan Neonaziyan li dijî cihûyan çi kirin, rejîma faşîst a Tirkiyeyê jî li dijî kurdan hovîtiyên dijwartir jî cih bi cih kirin. Karê ku îro li Efrîn, bakur û başûrê Kurdistanê digehînin encamê berdewama vê ye.

Niha pirsa sereke ji van rûdan û kiryarên ku li welatê me qewimîne kurd çiqas ji xewê şiyar bûne? Partî, rêxistin û saziyên Kurdistanê ji vê dîrokê çi ders wergirtine?

***(1, 2). Hevpeyvîna Dr. Sedat Ulugana bi şahidên fermana Geliyê Zîlan re.***

***(3). „Serhildêr di dema 5 rojan da hatine tunekirin."***



Cumhuriyet

Asiler 5 Günde İmha Edildi

Hükûmetin tebliği

